18 Weysi, Resûl – Futûhî, Suwâre, Çâwge I, Çâpxâneê Mukriyânî, Hewlêr 2013, 132-135. De -leyen yazar hikâyeyin sonuna şu ifadeyi koymuş: Diyarî Selah Payaniyanî-Mehabad.

**Not:** Bu Soranî hikâyeyin Latinize edilmesinde Öğr. Gör. Şerif GÜZEL'e şükran borçluyum.

nuna geçirilen iki çubuk. Zazakî *kilame*) yapman gereklidir. Hatta eğer bir yükten bir dirhem eksik olsa seni sorgusuz sualsız öldüreceğiz.”

Sultan Mahmud vezirin zekâsına hayran kaldı ve onu bu işe görevlendirdi.

Veziр marangozun kapısına gitti, durumu ona anlattı ve dedi: “Yarına kadar ağaçtan bir yük saban boyunduruğu *zelvesi* yapıp bize teslim etmen gereklidir.”

Olup bitenden habersiz olan ve Sultan Mahmud'un ona oyun oynadığını (onu siyah nohut aramaya göndermek istediğini) bilmeyen zavallı marangoz, neredeyse korkudan ölecekti. Endişeli ve tedirgin bir halde geldi, konuyu hanımına anlattı ve bir çare bulmasını söyledi. Çok bilgili, zeki, iffetli ve namuslu olan hanımı, konuyu anladı ve kocasına dedi: “Neden kendini bu kadar kaybetmişsin? Allah Sultan Mahmud'dan daha büyüktür.” Hanımı ne kadar çok ona moral verse de fayda etmedi.

Akşam olunca marangoz adam işe koyuldu, *zelve* yapmakla meşgul oldu ve hanımı da sürekli ona moral verek derdi: “Kalk gel, rahat şekilde uyu; Allah büyüktür.” Fakat marangoz şuurunu ve duygularını kaybetmiş ve korkudan bir türlü sakınleşemiyordu.

Sabah oldu, marangoz azıcık *zelve* yapabilmişti. Hanımıyla vedalaştı, dedi: “Şimdi şahin usaklıları gelir, beni götürüp darağacına asarlar.” Hanımı yine dedi: “Korkma! Allah Sultan Mahmud'dan daha büyüktür.”

Tam bunu konuşurlarken kapı çalındı. Marangozun rengi kaçtı ve korkudan neredeyse can verecekti. Hanımına dedi: “Benim gücüm kalmadı, sen git bak ne istiyorlar?” Hanım gitti, kapıyı açtı, gelenler Sultan Mahmud'un usaklılarıydı. Zavallı kadın zelveleri ve kocasını götürmeye geldiklerini zannetti.

Sordu. “Kiminle işiniz var?”

Dediler: “Kocamı götüreceğiz. Sultan Mahmud öldü. Onun için bir tabut yapması lazım.”

Kadın neşeye geri döndü, kocasına dedi: “Sultan Mahmud ölmüş. Sana demedim mi korkma, Allah Sultan Mahmud'dan daha büyüktür?”

Marangoz yine de inanmadı. Fakat gidip Sultan Mahmud'un ölmüş bedenini yakından görünce inandı.<sup>19</sup>

## F2.

خدا از سلطان محمود بزرگتر است.

**Xodâ ez sultan mehmûd bozorgter-est.**

**Allah Sultan Mahmud'dan daha büyüktür.**

<sup>19</sup> Hazrâ'î, 1046.

Bir gün Sultan Mahmud güzel bir kadını hamamdan çıkarken gördü. Bir gönülle değil bin gönülle kadına âşık oldu. Bir hilekâr kocakariya emretti: "Git filan eve bak, o güzel kadının kocası kimdir, öğren?"

Kadın dilenci kılığına girdi ve sora sora o kadının evine ulaştı. Yavaş yavaş söze girdi ve kadının kocasının bir marangoz olduğunu öğrendi.

Ertesi gün Sultan Mahmud adamını gönderdi, marangozu saraya getirdiler. Marangoza dedi: "Sana söyleyeceğim şu üç işten birini tercih etmen gerkir; ya kelleni uçuracağım ya hanımını boşayacaksın ya da bir arşın uzunluğunda yüz adet *zelve* yapacaksın." Zavallı marangoz biraz düşündü ve "*Zelve yapacağım*" dedi. Sultan Mahmud dedi: "Sana üç gün süre tanıyorum. Eğer yapamazsan basın darağacına, malın da şahın mali olacaktır." Ondan sonra marangozu gonderdi.

Çaresiz kalan marangoz huzursuz ve üzüntülü bir şekilde evine gitti.

Hanımı sordu: "Ey adam! Neden bu kadar üzgünsün?"

Marangoz başından geçenleri hanımına anlattı.

Kadın konuyu anladı. Kocasına dedi: "Ey adam! Sen hangi şartı kabul ettin?"

Marangoz dedi: "*Zelve yapmayı kabul ettim.*"

Kadın kocasına moral verdi ve dedi: "Ey adam! Üzülme. Allah Sultan Mahmud'dan daha büyültür."

Ertesi gün marangoz, belki mümkün olur diye birkaç *zelve* yapmaya çalıştı ama ne kadar uğraşsa da fazlasını yapamadı. Neticede üç gün geçti.

Marangoz, sultanın elçisi gelip kendisini götüreceğini beklerken hanımı da sürekli ona moral verip derdi: "Korkma! Allah Sultan Mahmud'dan daha büyültür."

Tam o sırada kapıdan ses geldi. Kadın kapıyı açmaya gitti ve kocasının götürmeye gelen bir elçiydi. Elçi dedi: "Marangoz nerede? Hemen saraya gelip Sultan Mahmud için bir tabut yapması lazım; Sultan Mahmud dün gece vefat etti."

Kadın neşeye içeri geldi ve kocasına haber verdi: "Ey adam! Demedim mi Allah Sultan Mahmud'dan daha büyültür. Kalk git, Sultan Mahmud için bir tabut yap."<sup>20</sup>

**Ek:** Son olarak Bitlis'le ilgili bir web sitesinde "Osta necar, raze wekî her car, Xwedê yeke derî hezar" şeklindeki Kurmancî atasözüne ve altına Türkçe'ye eksik çevrilen hikâyesine yer verilmiştir. Bu versiyonda diğerlerinden farklı olarak dikkat çeken özellik, kralın marangozdan "bir tabak üzerinde birbirini kovalayan bir fare, bir kedi ve bir de tazi yapmasını" istemesidir.

---

20 Zülfiqârî, Hesen, *Dâstânâ-yi Emsâl*, İntişârât-i Mâzyâr, Tahran ۱۳۸۵ hş., 439.

### **Osta necar, raze wekî her car, Xwedê yeke derî hezar.**

*Marangoz kalfası, her zamanki gibi yat, Allah birdir ama ihtiyaçları gidermenin bin kapısı vardır.*

Bu atasözü, bir kralın, bir marangoz kalfasına, bir tabak üzerinde birbirini kovalayan bir fare, bir kedi ve bir de tazı yapmasını emretmesi üzerine söylemiştir. Kral marangoz kalfasına 24 saat süre tanımış ve bu süre içinde istenenin yapmadığı takdirde idam edileceğini bildirmiştir

Bunun üzerine güç durumda kalan marangoz, uzun süre düşündükten sonra bu sözü söyleyip yatmaya karar vermiştir. Ertesi gün kralın ölmesiyle bu söz yazılmış ve atasözü durumuna gelmiştir. Sanatın günümüzdeki gelişmişliği karşısında, istenen iş bir çocuk oyuncası niteliğinde ise de, bu atasözü, marangozun Tanrı'ya güvenerek yatması gibi bir değer ve önem taşımaktadır.<sup>21</sup>

**Sonuç:** “Hoste Necar” (marangoz ustası) daha doğrusu ve orijinali “Habîb-ê Neccar” sözcüklerinin içinde geçtiği atasözünün formel ve sanatsal yapısına bakılırsa hem atasözünün hem hikâyesinin Kürt halk kültürü kaynaklı olduğu ve zamanla farklı motifler şeklinde işlenip günümüze kadar kuşaktan kuşağa aktarılarak geldiği görülür. Fakat atasözünün menşei ile ilgili aktarılan hikâyelerin değişik versiyonlarının tahkiyelerinin genel anlamda yeterince sağlam ve doyurucu olduğu söylenemez. Bu da her bir derleyicinin üslubu ve hikâyeleri aktarırken yaptıkları kişisel tasarruflarla ilgili olabilir.

Bu ortak atasözlerinde öne çıkan temel değerler; Allah'a imanın gereği olarak onun her şeyi aşan sınırsız büyülüğüne, gücüne, kuvvetine ve merhametine inanamak; ona samimiyet ve ihlâsla güvenip tevekkül etmek; onun hikmet gereği kulu için öngördüğü duruma rıza göstermek ve belalara karşı sabırlı olmak; bütün çarelerin tükendiği durumlarda insana yardımcı olacağını güvenip ümit etmek şeklinde sıralanabilir. Bu düşünce ve inancın temelinin; “Allah'ın eli (kudreti) onların ellerinin (gücünün) üzerindedir.” (*Kur'ân/Fetih*, 10; krş. Dihxodâ, II, 716); O herkesten daha merhametlidir.” (*Kur'ân/Yusûf*, 92; krş. Dihxodâ, II, 716); “Kim Allah'a tevekkül ederse, O kendisine yeter.” (*Kur'ân/Tâlâk*, 3) vs. ayetlerle hadislere dayandığı söylenebilir.

---

21 <http://www.bitlisname.com/2015/11/18/1918-atasozlerimiz-uzerine-bir-calisma> (Erişim: 13.11.2018/ 17:20)

## Kaynaklar ve Kısaltmalar

- Aksoy, Ömer Asım, *Atasözleri ve Deyimler Sözlüğü*, I-II, İnkılâp İstanbul 1988.
- Albayrak, Nurettin, *Türkiye Türkçesinde Atasözleri*, Kapı Yayımları, İstanbul 2009.
- Ateş, Süleyman, "Habîb en-Neccâr", *DIA*, XIV, 373-374.
- Badikî, Azad, *Pêşgotinên Kurdi Gotinên Berya*, ts.
- Bingöl, Abdulkadir, *Gotinên Pêşîyan û Biwej*, Weşanêن Na, İzmir 2014.
- Çiya Mazî, *Ferhenga Gotinên Pêşîyan*, Weşanêن Elma, 2005
- Dêhxodâ, Ali Ekber, *Emşâl u Hikem*, I-IV, Emîr Kebîr, 1363 hş.
- Dêrşewî, Mele Mehîmûd, *Mıştaxa Ciya Ji Gotinên Pêşîya*, (Latinize: Serbest Zaxoyî) Stockholm 1989.
- Hazrâî, Emîn, *Ferhengnâme-ê Emşâl û Hikem-ê Îrâni*, İntişârât-ê Nuvîd, Sîrâz 1382 hş./2003.
- Hesen, Bîlal, *Ji Wêjeya Gel: Pend û Peng*, 2008.
- <http://kuran.diyonet.gov.tr/mushaf/kuran-meal-2/yasin-suresi-36/diyonet-isleri-baskanligi-meali-1> (Erişim: 10.11.2018/18:20)
- <http://www.bitlisname.com/2015/11/18/1918-atasozlerimiz-uzerine-bir-calisma> (Erişim: 13.11.2018/ 17: 20)
- <https://ganjoor.net/roodaki/baghimande/sh49>. (Erişim: 11.01.2018/19:20)
- Lezgîn, Roşan, "Hebîbê Necar": <http://www.zazaki.net/haber/hebb-necar-2461.htm> (Erişim: 16.11.2018/21: 30)
- Nûpelda, Kaniya Gotinêن Bav û Kalan, Enqere 2014.
- Oncu, Mehmet, *Gotinên Pêşiyân*, Enstîtuya Kurdi, Stenbol 1992.
- Qâzî, Qâdir-ê Fettâhî, *Emşâl û Hikem-ê Kurdi*, İntişâr-ê Dânişgâh-ê Tebrîz, 1364 hş./1987.
- Rudenko, Margaret, *Efsânehâ-yê Kurdi* (Farsçaya çeviren: Kerîm Keşâverz), İntişârât-ê Âgâh, Tahran 1352 hş.
- Ruxzâdî, Ali, *Guwârey Kûrdewârî: Pend-ê Peşînîyân*, Senendec 1385 hş.
- Seccâdî, Seyyid Abulhamid Hayret, *Pendê Peşînân*, Hewlêr, 2010.
- Seydayê Tîrêj, *Serpêhatiyêن Kurdan* (*Dâstânhâ-yê Kurdi-yê Kurmâncî*), İran/ Qum 1393 hş.
- Seydayê Tîrêj, *Serpêhatiyêن Kurdan* (*Dâstânhâ-yê Kurdi-yê Kurmâncî*), İran/ Qum 1393 hş., 14.
- Tîrîs, Amed, *6762 Gotinên Peşîyan*, Weşanêن Rewşen, Stockholm 2001.
- Urdîşane Sisîl, *Efsânehâ-yi Kûrdân*, Cev. E. H. E. Şâlcî, Neşr-i Sâlis, Tahran 1386 hş.
- Weysî, Resûl-Futûhî, Suwâre, *Çâwge I*, Çâpxâne-ê Mukriyânî, Hewlêr 2013.
- Yurtbaşı, Metin, *Sınıflandırılmış Türk Atasözleri*, Ankara 1994.
- Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe: Gotinên Pêşîyan*, *Kilam-Dîlok û Çîrok I*, Weşanxana Çanda Kurdi, Stockholm 1989.

Ziyâdne, Sâlih, *Mine'l-emsâli'l-bedeviyye*, 1997 (Elektronik yayın 2003. www.nashiri.net; erişim 11.11.2018/ 09: 15)

Zûlfiqârî, Hesen, *Dâstânhâ-yi Emşâl*, İntisârât-i Mâzyâr, Tahran 1385 hş.

A: Arapça.

DÂA: *Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*.

F: Farsça.

Hş: hicrî şemsî.

K: Kurmancî.

S. Soranî.

s: sayfa.

T: Türkçe.



# ÇÎROKÊN WERGER ÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ (1797-1870) (VEKOLÎN-METN)

## Mela Mahmud Bazidi's Translated Stories (Review-Text)

Mustafa ÖZTÜRK<sup>1</sup>

---

### Kurte

Mela Mehmûdê Bazîdî wekî zanyarekî Kurd, xwedîyê ked û berhemên girîng in di gelek qadêن ji hev cuda de. Bazîdî di berhevkarîya folklorê, istînsaxa destxetêن Kurdî, nivîskarîya berhemên cûrbicûr, rêzimannasî, civaknasî û hwd de gelek xebat pêk anîne. Qadeke din ya ku Bazîdî bi wê re mijûldar bûye ji wergernasî ye.

Di Koleksiyona Aleksandre Jaba de destnivîsa bi hejmara Kurd 43'yê ji 84 çîrokêن Farsî û wergerên wan ên Kurmancî û Fransî pêk tê. Wergerên Kurmancî ji alîyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve û yên Fransî ji ji alîyê A. Jaba ve hatine kîrin. Ev çîrokêن ku dikarin li ser qada edebiyata klasîk bêñ hesibandin, li gorî agahîyêñ berdest, nimûneyêñ ewil ên çîroka pexşan a Kurdî ya klasîk in. Di vê xebatê de ewilî li ser çîroka klasîk bi giştî û taybetiyêñ destnivîsa Kurd 43'yê hatîye rawestan û pişt re ji tîpguhêziya destnivîse ya Kurmancî hatîye dayin.

**Peyvîn Sereke:** Mela Mehmûdê Bazîdî, Aleksandre Jaba, Edebiyata Klasîk, Farsî, Kurmancî, Werger, Çîrok.

### Abstract

Mela Mahmud Bazidi, who was a Kurdish scholar, created important works in various fields. Bazidi produced works in numerous fields such as compilations of folklore, copies of Kurdish manuscripts, writing of various works, linguistics, and social science. Another area where Mela Mahmud Bazidi spent effort was translation.

---

1 Dr. End. Pwd., Zanîngeha Mardin Artukluyê Fakulteya Edebîyatê Beşa Ziman û Edebîyatâ Kurdî. mustafaozturk47@gmail.com

In the collection of Aleksandre Jaba, in the manuscript with the archive number of Kurd 43, there are 84 Persian stories and translations of these stories into Kurdish and French. Kurdish translations were made by Bazidi and French translations were made by A. Jaba. The mentioned stories, which can be considered within the scope of the classical literature, are the first examples of classical Kurdish literature, according to the data is available. In this study, the category of story in Classical Kurdish literature was addressed, and afterwards, the transcriptional text of the abovementioned manuscript was presented.

**Key Words:** Mela Mahmud Bazidi, Persian, Kurmanji, Translation, Story.

### Destpêk

Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1870) yê zana û xwedî kesayetîyeke piralî, di gelek şaxên Kurdolojîyê de xebatêن hêja kirine û piranîya van xebatêن xwe jî piştî ku Aleksandre Jaba (1801-1894) dinase derxistine holê. Ji ber vê yekê, lêkolerên ku li ser Mela Mehmûdê Bazîdî dixebeitin, nabe ku derheqê Aleksandre Jaba yê dîplomatê Rûs de jî tiştinan nebêjin. Lewra A. Jaba, hema bêje di hemû xebatên Mela Mehmûdê Bazîdî de rê li ber wî vekiriye. Li gel vê yekê, di gelek xebatên bi vî awayî yê A. Jaba de jî yekser û neyekser tevkariya Bazîdî heye. Îroj çêtir kifş dibe ku bi hevkarîya van her du kesan, ji bo çand, edebîyat, dîrok û hwd a Kurdan berhemên giranbuha û ronîker derketine holê. Yek ji van berheman jî di qada wergernasîya Kurdî de ye.

Di *Koleksîyona Aleksandre Jaba Ya Destnîvîsêن Kurdi* de du nusxeyên heman berhemê hene. Nusxeyên bi hejmara Kurd 42 û Kurd 43 wergera 84 çîrokên Farsî bo Kurmancî dihewîne, ku di her du nusxeyan de jî ji bo berhemê tu nav nehatîye destnîşankirin. Ji ber ku Kurd 43 li gorî ya dinê têkûztir e, di tîpghûhêzîyê de ev nusxe hat esas girtin û her wiha nirxandin û lêkolînên wekî din jî dîsan li gorî vê nusxeyê hatin kîrin.

Çîrokên ku di vê berhemê de cî digirin, ji alîyê naverokê ve çîrokên pendgirtinê ne; lewra ne dirêj in, kurt in û tecrîbe û hîkmeta gel ya hevpar derdibirînin. Her wiha ev çîrokana ji aliyê avanîya xwe ve jî kurteçîrokên klasîk in û wekî çîrokên *Mesnewî* ya Mewlana û *Mentiqu't-Teyr* a Ferîduddîn Ettar li gorî rêçikên edebîyata klasîk hatine nivîsandin.

Li gorî agahî û daneyên berdest, di edebîyata Kurdî de, ci telfî û ci werger, berî vê berhemê tu daneyeke çîrokên klasîk ên pexşan (mensûr) ne hatine hilberandin. Ev berhem ji vî alîyî ve wekî berhema yekemîn tê xuyanê. Her çiqas çîrokên Mela Mûsayê Hekarî yê sedsala hivdehem hebin jî, ev çîrokana li ser qada gelêrî tên hesibandin. "Lê belê em ji arşîva Aleksandr Jaba dizanin ku Mela Mûsayê Hekarî hîn di sedsala XVII. de zêdetirî 50 çîrokên kurdî yên gelêrî

berhev kirine û ew bi navê *Durru'l-Mecâlis* wekî pexşankî nivîsîne (Pertev, 2014: 13).” Dîsan, berhemeye Bazîdî ya din jî heye, ku ew jî di qada gelêrî de ye. “*Camiayê Rîsale û Hikayetê Ekradiyye* li ser edebiyata kurdî ya gelêrî ye. Tê de 3 meqale û 40 çîrokêñ gelêrî hene (Pertev, 2014: 13).”

### **Çend Nîse Derbarê Çîroka Klasîk de**

Berhemêñ edebî bê guman bi dorhêla civakî û dînî ya civatê ve girêdayî ne û ji sedsalan vir ve wekî hefizeya civakî ya gelan hebûna xwe didomînin. Di nava berhemêñ edebî de gelek cûreyên menzûm û mensûr hene. Ji vana jî ciyê çîrokan gelekî girîng e. Wekî yên din çîrok jî ji giyana gel der çûye, di nava xwe de nirxên gel yên hevpar hewandîye û bi xwedîtiya mîrateyeke çandî ya dewlemend hebûna gel ya neteweyî bi awayekî rast û dirust parastîye. Çîrokêñ ku Bazîdî ji Farsî wergerandine, her çiqas ji ziman û edebiyata Farsan be jî, mesajê ku dide xwendekaran ji bo çand, jîyan û paradigmaya hemû netewêñ rojhilatî derbasdar in.

Derbarê jêderka çîrokêñ klasîk yên li rojhilat de, gelek zanyar teorî pêşkêş kirine; lê belê di vê derbarê de herî zêde wekî jêderka çîrokan qisseyên Quranê têñ pejirandin. Li gorî nêrîmêñ giştî çîrok, weke cureyeke edebiyata klasîk jêderka xwe, di serî de bi bandora İslâmîyetê ji qisseyên Quranê, menqibeyên ewlîya û enbîyayan wergirtîye.

“Bingeha çîrokêñ kurt Quranâ pîroz e. Di Quranê de qisse, ku em dikarin qisseyan wekî çîrokêñ kurt jî binav bikin, ciyekî girîng zeft dîkin. Li gorî tesbîta lêkoleran ji çara sê parçeyê Quranê ji van qisseyan pêk tê. Dema ku Xwedê Te’ala bi navgîniya Cenabê Pêxember mirovatîye vewwendî rîya rastîye kirîye, ji bo ku heqîqet li ber çavêñ wan şenbertir bibe, di Quranê de van qisseyana nimûne girtîye. Ev kurteçîrokêñ Quranê, ku bêhtir ji bo ifadekirineke zelal û bandorkirinê hatine bi kar anîn, bi navgîniya taybetmendîyen islûba xwe, bandor li ser hemû mielîfîn İslâmî û berhemêñ wan kirîye (Ayan, 1991).”

Wekî cûreyeke vegotinê peydabûna çîrokê li civaka rojava û rojhilatê pêvajoyeke nêzîkî hev parve dîkin. “Çawa ku di edebiyata rojava de pêşîyê destanêñ Yewnanî û pişt re jî qisseyên Tewrat û Încîlê bûne çavkanîya çîrokêñ rojavayî, bi heman awayî di kelepora çîroka rojhilat de jî çîrokêñ Hind û Cahilîye û herî dawîn jî qisseyên Quranâ pîroz bûne çavkanî (Yazıcı, 1998: 480).”

Ahmet Hamdi Tanpinar, çîrokêñ klasîk wekî *Çîroka Şerqê* bi nav dike û van çîrokan ji rasteqîniyê dûr dibîne, û her wiha wesfa bingehîn ya vê kevneşopîya çîrokê jî wekî ji her alîyî ve wekî çêkirî rave dike (Tanpinar, 1988: 289). Li gorî wî, çîroka şerqê realîteyê încar dike û mirov ji fikra rasteqîniyê dûr dixe. Ji ber vê yekê ye ku çîroka şerqê di çarçoveya folklorê de maye (Tanpinar, 2000: 61). Pertev Naili Boratav jî, tunebûna rasyonalîteyê di çîrokêñ klasîk de kêmeñîya

herî mezin qebûl dike û vê xalê wekî cudabûna di navbera çîrokên klasîk û modern rave dike. Li gorî Boratav çîroka modern jî xwe dispêre rasyonalîteyê (Tökel, 2000: 45-46). Li gorî Tanpinar û Boratav çîroka klasîk ji rasyonaliteyê û bi gotineke din jî ji realîteyê bêpar e. Lê wextê ku em li naveroka çîrokên Bazîdî yên wergerandîye dinerin bi tu awayî tiştekî aşopî, derasayî û derî aqil bi ber çavan naeve. Bûyer, leheng û qewimînên di van çîrokan de, bê awarte, rasteqîn in û tiştekî ku aqil qebûl neke di wan de tune ye.

Hasan Kavruck, çîrokên klasîk ji alîyê çavkanîyê ve senifandîye û wan wek yên wergerî, yên telîf û yên ku ji çîrokên bîyanî hatine adaptekirin di sê besan de tesnîf kirîye (Kavruck, 2000: 526). Li gorî mijarê jî çîrokan wekî qehremanî, macerayî, dînî-tesewiffî, exlaqî û letîfeyî dabeş kirîne (Kavruck, 1998: 14).

Ligorî senifandina Kavruck, çîrokên ku Bazîdî wergerandine, ji alîyê çavkanîya xwe ve bêguman çîrokên wergerî ne. Em dikarin çîrokên Bazîdî ji alîyê mijar û naverokê ve jî hem dinî-tesewiffî, hem exlaqî û hem letîfeyî qebûl bikin. Lewre ev 84 çîrokên ku em behsa wan dikan, bigelempêrî pêkenokî ne û di armanca şîretkirina dîn û exlaqê de ne.

Di kevneşopîya çîrokên edebiyatê rojhilatî de berî her tiştî mesaja başiyê, rastiyê û xweşikayîyê heye. Digel vê yekê bi zimanekî ne dîdaktîk, lê belê bi vegotineke pîsporane xwendevan di bin tesîra xwe de dihêle. Ev hewla çîrokê giş, bi hilkefta çalakîyeke hunerî, ji bo gihîştina insanê kamîl e. (Tosun, 2017, 43). Ji ber ku çîrokên Bazîdî dinî-exlaqî ne, mebest jî bi xwe lêgerîna insanê kamîl e, ango pêkanîna merivê qenc e.

### **Çend Agahî Derbarê Destnivîsa Kurd 43'yê de**

Destnivîsa Kurd 43 bi tevahî 102 wereq e. Wiha xuya ye ku destnivîs di hundurê zerfekê de hatiye parastin û li ser ruyê zerfê jî bi destxeta A. Jaba bi Fransî du hevok hatine nivîsandin:

*84 Contes persans tradues en Kurde par Mella Mahmoud Bazidi.*

*Traductions française avec les textes perans et Turc en regard par Auguste Jaba<sup>2</sup> (Bnr.: Pêvek 1).*

Di hevoka duyem de behsa metneke Tirkî jî hatîye kirin lê tu metneke Tirkî di naveroka vê destnivîsê de tune ye. Her wiha agahîyen nêzîkî vana di pêsiyê de di wereqeya 1a'yê de jî hene. Tenê cudahîyek heye ku A. Jaba li vir unwan, cî û dîroka destnivîsê jî nîşan daye:

*... Consul de Rusie en retraite. Smyrne 1868.<sup>3</sup>*

2 84 çîrokên Farsî wergerên wan yên Kurdi ji alîyê Mela Mehmûdê Bazidî ve. Wergera Fransî ligel metnên Farsî û Tirkî ji alîyê Auguste Jaba ve.

3 Konsolosê Rûsyâ yê malnîşîn. Izmîr 1868.

Ji bo vê berhemê li tu cîyê nusxeyê nav an sernav nehatîye destnîşankirin. Gelo Bazîdî van çirokana ji berhemeke Farsî wergirtîye yan jî ji xwe re ji edebîyata Farsî berhovoka çirokan dirust kiriye, ev yek ne kifş e. Digel vê yekê, her çiqas navek ji bo berhemê nehatibe destnîşankirin jî, çirokên berhemê ji 1'ê heta 84'ê hatîye hejmarkirin.

Berhem ji 84 çirokên Farsî pêk tê. Ev çirokana berê bi halê orijinal yanî bi Farsî hatine nivîsandin. Bazîdî wergera van çirokan a Kurmancî nivîsandîye û piştre A. Jaba jî li kêleka wergera Kurmancî tîpguhêzîya wan a Latînî nivîsandîye. Her wiha A. Jaba wergera Fransî jî li kêleka metnê Farsî nivîsandîye. Li gorî vî halî, her rûpel wekî du sitûnan hatîye bikaranîn. Di rûpelên rastê de (wereqên b'yê) wergera Bazîdî ya Kurmancî û tîpguhêzîya A. Jaba li nik hev cî digirin. Di rûpelên çepê (wereqên a'yê) de jî metnê Farsî û wergera A. Jaba ya Fransî li nik hev in (Bnr.: Pêvek 3, 4).

Ji xeynî agahîyên navborî, derbarê destnivîsê de hin taybetîyên nusxeyê wekî din jî hene. Destnivîs bê berg e, wekî berê jî hate gotin, wereqên destnivîsê di hundurê zerfekê de hatine parastin. Di nusxeyê de kaxezêner zer û asayî hatîne bikaranîn. Li jora wereqan bi Erebî, li jêra wereqan bi latînî hejmarêne rûpelan hene. Her rûpel bi 13 xêzan hatine xézkirin. Ebada nusxeyê 23X33 cm. ye. Metna orijinal û wergera Bazîdî yanî besênu ku bi herfîn Erebî hatine istînseksirin bi xeta ruq'eyê ne. Ji şibihandina wan tê famkirin ku ji bilî wergera Kurmancî metnê Farsî jî bi destxeta Bazîdî ye.

### **Çend Nişe Ji Bo Tîpguhêzîya Metnê**

Tîpguhêzîya nusxeyê, heta ji dest hat li gorî rê û rîçikên zanistî hat kîrin. Lewma, heger mistensix (Bazîdî) şaş nivîsandibe jî me dest lê ne da, ci be me ew esas girt. Lewre tu mafê me tune ye ku em şaşiyêni mistensix rast bikin.

Karê tîpguhêzîyê tenê ji bo beşa Kurmancî hat kîrin û herfîn transkrîpsiyonê yên taybet ne hatin sepandin. Tenê herfa eyn (ئ) û hemzeyê (ء) bi işareta dabirrê (‘) hat nîşdayin.

Derbarê kelîmeyên ku di xwendin û teşxîsa wan de dijwarî hebûn, me ji tîpguhêzîya A. Jaba jî sîd wergirt. Lê belê ji ber ku, bi ihtîmaleke mezin, A. Jaba çawabihîstibe wiha nivîsandîye û bivê nevê di Kurmancî de zêde ne pîspor e, şaşî di nivîsandina wî de hebûn. Di cîyên wiha de me berê xwe da metnê Farsî.

Wekî hemû destnivîsên klasîk, di vê metnê de jî rîzîkên xalbendîyê û rastnivîsê nehatibûn tetbîqkirin. Rîzîkên xalbendîyê ji bo hêsanbûnê me bi teserûfa xwe bi kar anîn. Xal, bêhnok, baneşan, dunik û hwd ci hebin, di metnê resen de tune ne, bi teserûfa me lê hatin zêdekîrin. Sînorêne wereqan bi kevanekîn koşedar hatin ifadekirin: [1b], [38b], [92b] ... Ji bilî vana, wateyêne bêjê û têgînên di metnê de yên ku zêde nenas jî bi jêrenotan hatin destnîşankirin.

## METN:

### [1b] HİKAYETA İBTİDA

Du jin derheqê zarokekî de'wa dikirin û şahid jî tune bû. Her dû çûne nik qazî. Ü hikm ji qazî xwastin. Qazî cellad gazî kir. Emir kir ku vî zarokî du parce bike û bide her du jinan. Jinek ku ev xeberabihist bêdeng ma. Ü jina dinê dest bi gazî û zarîyê kir ku, "Di rêya Xudê! zaroyê min du parce meke. Eger 'edl wuha ye ez zaroyî naxwazim." Qazî tehqîq kir ku dîya zaroyî ev e. Zaroyî ra bi wê si-part û jina dinê ra qamçî lê da û qewirand.

### HIKAYETA DUYAN

Merifek çû nik xwendekar<sup>4</sup> û ïfade kir ku, [2b] "Merifekî dâyîma tête mala min û digel jina min dostî heye; lakin weqtê wî nizanim û wî nabînim ku kî ne. Ewî dixwazim bigirim. Ji hezreta we hêviya intîqam û 'edlî didêrim." Xwendekar şîşeyekê 'itrê da wî û emir kir ku, "Vê bispêre jina xo û bêjî ku, bi kesekî nede." Ü mîrik wusan kir. Xwendekar çend casûs tayin kir, ku li mala wî rûnên û ji cilê herkesî ku behna 'itrê bi ewê bigirin û bînin. Hasilî, mîrik firset dît û balî jinikê ve çû, 'itr di cilêd wê malê ve jinik got ku, "Eger çî mîrê min emir kir ku vê 'itrê mede kesekî. Lakin tu ku can di ruhê min î. Eger eva bi kêrî tê neyî êdî [3b] ji boy ci bikêr têtin." Mîrik ji wê derê biderket. Casûsan ji bêhna 'itrê, serê rê girtin û êsîrkirî birine pêş xwendekar. Xwendekar jî ew merif xwast û got, "Yarê jina te hazir e. Ewî bibe bikuje yan bibexşîne."

### HIKAYETA SÊYAN

Jinek çû nik qazî û got ku, "Filan merif cebrî digel min zina kir." Qazî jî ew merif teleb kir û pirsîyar kir ku, "Ji bo ci te avrûya vê jinê dît?" Mîrik înakir kir. Qazî emir kir ku deh rub'ye cirm bide vê jinê. Mîrik naçarî, bêsebeb hikmê qazî, zér da jinikê. Wekî jin biderve çû, qazî emrî mîrikî kir ku, [4b] "Here, dirafê xo ji jinikê bişûve<sup>5</sup> bîstîn." Mîrik ku ev hikma dît, bezî û çiqasî ku xwast cebrî rub'yan<sup>6</sup> ji jinikê bişûve bistîne nikarî. Jin bişûve hate nik qazî û ïfade kir ku, "Ew merif cebrî rûb'yan ji min distîne. Heta niha min ne dayê. Eger riza we heye bidim." Qazî got, "Merikê ku bi zorê diraf ji we istandin nikarî, bê riza we çawan karî ku digel we zina bike. Tu derewîn î. Here û diraffî bidê û paşî wuha buhtan û iffîran meke."

### HIKAYETA ÇARAN

Di bajarekî 'embarekî penbo hate dizîn. [5b] Penbofiroşan şikayet birin nik xwendekar. Xwendekar her çiqas pirsîyar emir kir, dizî nedît. Mîrek ïfade kir, "Eger emir bide ez dizan bigrim." Xwendekar jî hikim da. Mîr çû mala xo û

4 Ev kelîme ji dêleva "sultan", "hikimdar" û "padîşeh" tê bikar anîn.

5 Şûnve. Şünde.

6 Cureyeke diravê ye ku wateya wê "çaryek, çarîk" e.

mezin û biçûkê bajêr bi behana mîvanîyê hemû gazî kir. Weqtê ku merif hemû li wê derê berhev bûn û rûniştin, mîr çû wê meclisê û bi rûyê hemû merifan nihêrî û got. “Çi heramzade û bê heyâ û ehmeq merif in ku penbo dizîne û hûrêd penboyan di nêv rihê wan cîh kirine û hettanî meclisa min.” Çend merifekan wî weqtî rihêd xo [6b] bi deste xo pak kirin û me'lûm bû ku ew diz in. Xwendekar li wê hikimê mîrî aferin û tehsîn nîşan da.

## HIKAYETA PÊNCÊ

Mirofek çû nik xwendekar û got ku, “Şeva dinê merifek ji leşkerê xwendekar cebrî hate mala min û digel carîya min zina kir”. Xwendekar emir kir, “Eger ev merif tekrar bête mala we heman wê demê xeberê ji bo min bîne.” Şeva duyê ew merif tekrar hat. Xoyê malê xwendekar xeber da. Xwendekar jî şîr di dest da girtî, [7b] digel wî rewan bû. Weqtê ku gîhişt mala wî berê çira vemirand, paşê wî ew merif kuşt. Ü paşê çira xwast û rûyê wî merifi dî û şîkrê Xudê kir û gote xoyê malê, “Her zadê ku di mala we mewcûd e bîne.” Xoyê malê zad anî. Xwendekar jî zehf bi dilxoşî ew zad xor. Xoyê malê pirsiyar kir ku, “Ey xwendekar, bi sebebê ci berê te çira vekuşt û paşê ew merif kuşt. Rûyê wî merifi we dît, şîkrê Xudê kir û zad jî bêweqt we xor?” Xwendekar emir kir ku, “Min zen bir ku, bixeर ji kurrê min ji kesekî ra quđret [8b] nîne. Ji bo wê sebebê ji ibtîda min çira vemirand ku, eger rûyê kurrê xo bibînim ji rehmê ewî nikarim bikujim. Wekî hate kuştin min çira teleb kir û rûyê wî dît û şîkrê Xudê kir ku kurrê min nîne. Wê weqtê ku te ji min ‘edl xwast, min digel xo got ku, *hetawî merifi nekujim, qet tiştekê naxum*. Ji wî weqtî esla<sup>7</sup> min nexoribû. Ji bo wê qewî bîrsî bûm û min zadê bêweqt xor.”

## HIKAYETA ŞEŞÊ

Melayekî hezar rub’îye bi ‘ettarekî siparî û çû seferê. Paşî middeyekê [9b] ji seferê bişûve hat û rûb’îye ji ‘ettarî xwast. ‘Ettar got, “Derew dibêjî, te ne siparî min.” Mela digel wî ‘alliqî û merif jî berhev bûn û mela derewîn deranîn û go-tin, “Ev ‘ettara zehf dîndar e, ti weqtê xiyanet ne kirîye. Eger digel wî mubahe-se bikî, ceza xo dixwazî bibînî.” Mela ‘aciz bû, naçar ehwalê xo li ser kaxezekê nivîsî û nîşanî xwendekar da. Xwendekar emir kir “Here li nik dikana ‘ettarî sê rojan rûnê, qet tiştekê mebêje. Roja çaran bi wê terefê dixwazim bêm û selam li te dikim. Bixeर cewaba selamê qet digel min mebêje. [1ob] Wekî ji wê derê diçim, dirafê xwe ji ‘ettarî bixwaze. Her ci ku ew dibêje min xeberdar bike.” Mela jî miwafiqî emrê xwendekar, li ber dikana ‘ettarî rûnişt. Roja çarê xwendekar digel heşemetekî zahf bi wê kenarê çû. Wekî mela dît hespê xwe vegirt silav li melayî kir. Mela cewaba silava xwendekar got. Xwendekar emir kir, “Êy bira, carinan bi nik min nayî û qet halê xwe nabêjî min”. Mela hindek serê xwe hejand. Bixeर ji wê qet negot. ‘Ettar ev hemû dîtin û ditirsîya. Wekî xwendekar

7 Qet. Zînhar. Teqeż.

çû ‘ettar gote melayî, “Wekî te diraf ispartîye min ez li ku bûm û kîjan merif jî wê hingê li nik min hazir bû?” Eva ji wî pirsîyar kir: [11b] “Bışûve bibêje, dibe ku min bîr kirîye.” Mela jî hemû ehwal bisûve got. ‘Ettar got, “Rast dibêjî, niha hate bîra min” Xulase, hezar rub’iyê melayî da û ‘ozr xwast.

### **HIKAYETA HEFTÊ**

Du merifan mala xo sipartine pîrejinkekê û digotin ku, “Her ci weqtê ku em her du dixwaze bêm malê xo digirim.” Paşî çend rojekan mirofek ji wan hate nik jinikê û got, “Hevalê min jî mir, niha malê min bide”. Pîrejin naçar bû û ew mal da. Paşî çend rojekan merifê dinê hat û mal xwast. Jinikê got “Hevalê te bir [12b] û ji te ra mirîye got.” Û beyan kir, “Her çiqas min se'y kir, lakin xeberê min ne bihîst û mal hemû jî bir.” Merifê me'lûm jinik bir nik qazî û ji qazî hikim xwast. Paşê milaxazayê<sup>8</sup> gîha ku jinik bê teqsîr e. Emir kir ku, “Ji îbtîda da te şert kiribû ku, ci weqtê ku em her du heval hatin dê hingê malêd xo digirin. Tu here hevalê xo bibîne û malî bistîne. Bitenê çawan dikarî bistînî?” Mêrik bê cewab bû û rîya xo girt.

### **HIKAYETA HEŞTÊ**

Xulamek ji nik axayê xo revî. Paşî çend rojekan axayê wî çû bajêrekî dinê. [13b] Xulam li wê dere dî û ji wî ra got û girt “Ji bo ci revî?” Xulam destê xo li damena axayî da û got, “Tu xulamê min î û dirafekî zahf te ji min diziye û revî û niha min tu dîtî. Dixwazim ku li te ceza bikim.” Xulase, her du bi hev ra çûn nik qazî û hikim xwastin. Qazî jî ew herdukan li nik şibakê da sekinandin û emir kir ku, “Hûn her dû bi carekê serêd xo ji şibakê bi derve bikin.” Wekî herdûkan serê xo biderve deranîn, emrî celladî kir ku bi şîr li serê xulamî bide. Xulam weku ev xebera bihîst, filhal serê xo bi hinduro kêşa û axayê wî qet esla ne lepitî. Qazî li xulamî ceza kir û siparte xoyî.

### **[14b] HIKAYETA NEHÊ**

Merifekî malekî zehf siparte serrafelekî û çû seferê. Wekî bisûve hat xwastin kir. Serraf jî încar kir. Û sond xwar ku, te ne sipartîye min. Ew merif çû nik qazî û ehwalê xo got. Qazî, mela hez kir û emir kir bi kesekî bibêje ku, filan serraf malê te nade. Tedbîrekê ji malê te ra dixwazim bikim.

Roja dinê qazî serraf gazî kir û got, “Zehf şixulîn hatîye pêş min. Bitenê hikim kîrinê nikarim. Dixwazim ku te ji bo xo nayîb bikim. Lewra ku tu merifekî sahib dîn î.” Serraf jî qebûl kir û zehf xoşhal bû. Wekî hat mala xo [15b] qazî ew merif teleb kir û gotê ku, “Niha here malî xo. Ji serrafi bixwaze elbete malê te dide” Ew mîrik çû nik serrafi wekî serrafi rûyê wî dîtî, “Were were, xoş hatî. Min malê te ji bîr kiribû. Şevê dinê hate bîra min.” Xulasa malê wî da û ji tema'a

8 Bi baldarî fikirîn. Kifşkirina bi hûrgîlî derbarê meseleyekê de.

nayîbîyê çû nik qazî. Qazî got, “Îro çûbûm nik xwendekar min bihîst ku şuxlekî mezin dixwaze bête sipartin. Min ji Xudê ra şikir kir ku rutbeyekî mezin dixwazî bigrî. Niha lazim ku nayîbê dinê ji bo xo tedarik bikim.” Xulase, qazî ew merif bi vê hîleyê izin da.

### [16b] HIKAYETA DEHÊ

Jinekê digel jinekê cîranê dijminî didêra. Şevekê mey zehf vexwar û serxoş bû. Û zaroyê xo kuşt û havête mala jinika cîranê. Û sibeyê li jinikê iftîra kir ku, “Zaroyê min kuştîye.” Ew jinik bire pêş qazî. Qazî berê jinika cîranê bire xelwetê<sup>9</sup> û zehf tirsand. Û got, “Rast bibêje. Û ger ne, dixwazim te bikujim.” Jinik sond xwar û înakir kir. Qazî got, “Eger li ber min rûbirû tazî dibî ez te rastgo zen dikim.” Jinik ji şerman serê xo derbejêr kir û got, “Min bikuje qebûl e, lakin wuha tazîbûyinê ji min hêvî meke, [17b] nakim.” Qazî izna wê jinikê da. Jinika ku hewar, gazî dikir anî xelwetê û got, “Eger li nik min tazî dibî ez xebera te bawer dikim.” Ew ji nik xwast ku xo tazî bike. Qazî men’ kir û got “Te bi xo kurrê xo kuştîye.” Wekî çend qamçî lê da. Qamçî xwar îqrar kir ku, “Min bi xwe qisûr û iftîra bi serê wê danî.” Xulase, qazî ew kêşa darê.

### HIKAYETA YAZDEHÊ

Merifek du hezar rub'îye di nêv kîsekî serbemuhr isparte qazî û bi xo çû seferê. Wekî<sup>10</sup> bişûve hat kîsikê xo wuha serbemuhr ji qazî [18b] istand û vekir, pûlek dît. Digel qazî de'wa girt. Qazî got “Here, derew mebêje. Te rub'îye jî nîşanî min ne daye û ne ispartîye min. Kîsekê serî mohrkirî ku ispartîye min wusan dîsan bişûve istandî.” Merifêd qazî ew qewirandin û merif çû nik xwendekar û halê xo ïfade kir. Xwendekar hindekî milaxeze kir. Emir kir, “Niha here û kîsikê li nik min bihêl. ‘Edla te dixwazim bidim.’ Roja dinê xwendekar, mîndera ku nû li ser textê bû hindek ker<sup>11</sup> kir û çû nêcîrê. Xizmetçê ku wê rojê dora wî bû, wekî mînder hilanî, dît ku mînder ker bûye tırsîya û lerizî. Û xulamê dinê ku wuha dît gote wî ku, ci bûye ku wuha ye bi wî got: [19b] “Eger xwendekar vê bibîne dixwaze min bikuje” Got, “Kesekî ev xebera bihîstîye, ya mînder dîtîye?”. Got “Na.” Wî got, “Metirse, di vî bajêrî vehonkerek<sup>12</sup> heye qewî qabîl. Mînderê bibe nik wî. Wusan dikare vephone ku kesek qet ferq nake.” Xulam çû dikana wî û mînder da wî û got, “Her ci dixwazî didim te, lakin biqencî vephone.” Vehonker nîv zêr xwast. Xulam zêrekî temam bi wî bexşî. Vehonker di şevekê ve hona û da xulam. Roja dinê mînder dîsan li ser textê raxist. Xwendekar wekî mînder sax dît, ji xulamî pirsîyar kir ku, “Ev mîndera kê honaye?” Xulam berê înakir kir. Xwendekar emir kir ku, “Qet metirse, ji bo mesleheteke min ev perçe kiribû.” Xulam

9 Bi tenêyî. Bi awayekî veşartî.

10 Di wateya “çawa ku” de tê bi kar anîn.

11 Parçê. Pirt. Qet. Par.

12 Honanker. Tevnker.

jî salix da ku [20b] xwendekar ew vehonker xwast û got ku, “Wekî vê kîsikê ne honaye?” Got, “Belê”. Got, “Wekî kîsikê bibînî nas dikî?” Got, “Erê.” Xwendekar kîsik nîşan da. Vehonker kîsik nas kir û got, “Qazîyê vî bajarî ji bo vehonanê dabû min.” Xwendekar qazî teleb kir û got, “Li ser dîndarîya te min bawerîyekî temam didêra. Li ser vê xeberê mansiba<sup>13</sup> qazîtîyê min dabû. Min nizanî ku tu diz î. Malêd merifan ji bo çi didizî!” Qazî got, “Ey xwendekar, kî dibêje?” Got, “Ez dibêjim.” Paşê kîsik nîşan da û cihê honanê nîşan da. Qazî şerm kir. Xwendekar qazî şande zindanê û emrî xoyê kîsikê kir ku dirafê xo ji qazî bistîne. Qazî naçarî dirafê wî da. Roja dinê [21b] xwendekar, qazî kêşa darê.

### **HIKAYETA DÎWAZDEHÊ**

Merifekî, kîsikê dirafê wî di mal da wenda bû. Ew jî xeber bi qazî da. Merifêd malê teleb kir û bi her kesekî zillek<sup>14</sup> da ku evê wuha bikin ku hemû di dirêjayî da wekî hev bin û got, “Her kî diz e, zilla wî biqasî tilûyekê dirêj dibe.” Wekî izna çêkirinê bû, merifê ku diz bû tırsîya û biqasî tilûyekê ji zilla xo tıraşî. Roja dinê ku qazî hemû teleb kirin û zill hemû dîtin. Me'lûm kir ku diz kî ne. Dirafi ji wî istand û te'dîb kir.

### **[22b] HIKAYETA SÊZDEHÊ**

Merifekî digel yekî şert kir ku, “Eger ez leyizê nebim kerekî<sup>15</sup> goş ji wicûda min bitiraş.” Wekî leyizî nebîr. Midde’î jî biciânîna şertê xo xwast. Ewî qebûl nekir. Her du çûn nik qazî. Qazî gote de’waçî, “Efû bike.” Qebûl nekir. Qazî ‘errinî. Qazî emir kir ku, “Bitiraş, lakin eger hindikî zêde ji şertê eger bitiraşî dixwazim ku siyaset li te bikim.” De’wacî ji vê xeberê ne karî, naçar ‘efû kir û bexşî û borî.

### **[23b] HIKAYETA ÇARDEHÊ**

Du birayê mendebûr çûne seferê û di rê da kîsikî tijî zér û parce cewahir dîtin. Birayê biçûk jî got, “Merama min hasil bû. Niha dixwazim ku herim mal.” Birayê mezin got, “Dixwazim dinyayê temaşa bikim.” Û zér parê kirin. Birayê mezin payê xo bi birayê biçûk, sipart û got, “Bide jina min.” Wekî ew gîha mal, para birayê xo da jina wî. Meger ku cewahir jî ne da. [24b] Paşî sê salan birayê mezin jî ji seferê hate mala xo. Cewahir li nik jina xo ne dî. Ji birayê xo pirsiyar kir ku, “Cewahir çawan bû?” Got, “Min da jina te.” Got, “Ew dibêje ku min ne dî.” Got, “Derew dibêje.” Ew merif dest bi tekdir û texdirâ jina xo kir. Jin jî revî û çû nik qazî û halê xo bişûve got. Qazî jî mîrê wê digel birayê wî teleb kir. Û ji birayê wî pirsiyar kir ku, “Wekî te cewahir bi vê jînikê sipart, kesek wê weqtê hazir hebû ya ne?” [25b] Got, “Du kes.” Qazî emir kir ku, “Here bîne.” Ew jî hindek diraf da wan û got, “Digel min werin û li nik qazî bicîhî derew şahidiyê

13 Meqamê bilind. Paye.

14 Darîkê pirr zirav.

15 Parçe. Beş. Par. Pirt.

bidin.” Hasılı, ew du merif şahidî dan. Qazî jî emrî mîrê jinikê kir ku, “Here, cewahirê ji jina xo bistîne.” Jinik bi girî ji nik qazî çû bi nik xwendekar û ehwalê xo jê ‘erz kir. Xwendekar emir kir ku, “Ji bo çi naçî nik qazî?” Got, “Çûbûm, lakin bi qencî hikim nekir.” Xwendekar jî ew her du bira jî digel her du şahidan jî [26b] xwast. Û her yek ji hev cuda kir. Û şîma<sup>16</sup> da ku li sûretê wê cewahirê jî çêkin. Ew herdû bira misawî<sup>17</sup> çêkirin. Ew her du şahid jî bi sûretê mixtelîf. Xwendekar emrî jinikê kir ku, “Tu jî çêke.” Înadê kir ku, “Min cewahir ne dî, çawan çekim?” Xwendekar jî sîyaset li şahidan kir. Emir kir ku, “Eger rast bibêjin dixwazim ji we biborim. Û eger ne, dixwazim bikujim.” Naçarî ifade kirin, “Bi derew me şahidî daye.” Xwendekar çend qemçî li birayê biçûk da. Îqrar kir ku, “Min qisûr kirîye.” [27b] Xwendekar li qazî jî ‘îtab emir kir ku, “Ji bo çi te bi qencî hikim nekir.” Û cewahir jî da jinikê.

### HIKAYETA PANZDEHÊ

Ciwanekî sed zêr isparte pîremêrekî û çû seferê. Bişûve hat zêrrêd xo xwast. Pîremêri încar kir, “Te ne daye min.” Ciwan bire nik qazî pirsîyar kir. Qazî jî pîremêr xwast û pirsîyar kir ku, “Eve ciwana zêr sipartîye te.” Got, “Na”. Qazî emrî ciwanî kir, “Kesek [28b] şahid didêrî?” Got, “Na.” Qazî gote pîremêri ku, “Sond buxu”. Ciwan girî û got, “Qet wefa wî jî sondê nîne. Zehf caran bicîhê derew sond xorîye.” Qazî gote ciwanî, “Weqtê te zêr isparte wî, li ku rûniştî bûyî?” Got, “Li binê darê.” Got, “Ji bo çi dibêjî şahid nîne? Ew dar şahidê te ye. Here nik wê darê û bibêje ku, qazî te dixwaze.” Pîremêr kenî. Ciwan got, “Ey qazî ditirsim ku dar bihikmê we neyê.” [29b] Qazî got, “Mohra min bibe û bibêje ku eva mohra qazî ye. Elbete dixwaze bêtin.” Ciwan mohra qazî girt û çû. Qazî paşî sa’etekî ji pîremêri pirsîyar kir, “Ew ciwan gîha nik darê?” Got, “Na.” Wekî ciwan çû nik darê mohra qazî nîşan da û got, “Qazî te dixwaze.” Ji darê qet nebihist. Bi xem bişûve hat û got, “Mohra we min nîşanî darê da, qet cewab ne da.” Qazî got, “Belê, dar hat û şahidî da, bişûve çû.” Pîremêr got, “Ey [30b] qazî, ev çi xeber e, qet dar ne hate vira.” Qazî got, “Rast dibêjî. Ne hat, lakin wî weqtê ku min ji te pirsîyar kir ku ciwan gîha darê, te cewab da ku, ne gîha. Eger te li bin wê darê diraf ne istandîye ji bo çi te ne got ku, kîjan dar e, ez nizanim. Ji vê me'lûm e ku ciwan rast dibêje.” Pîremêr îlzam bû ‘û diraf da ciwanî.

### HIKAYETA ŞANZDEHÊ

Masîgirek dayîma masîyêd behrê [31b] digirt û di sûqê da difirot. Rojekê masîyekî saq<sup>18</sup> girt. Wusan deha<sup>19</sup> masîyekî rind weqtekî ne girtibû. Bi dilê xo

16 Mûm. Şemal.

17 Wekhev. Yeksan.

18 Laq. Qelew û bigoşt.

19 Hêj. “Daha” ya Tirkî.

got ku, “Eger ez vî masîyî di sûqê da bifiroşim zêde ji du û sê pûlan bidest nayê. Qencî ew e ku bibim nik xwendekar. Qata<sup>20</sup> dixoze ku zehfîhsan digel min bike.” Hasilî, masî bire nik xwendekar. Xwendekar wekî masî dî, zehf begen kir<sup>21</sup> û xoşnûd bû. Û emir kir ku, “Sed rub’ye bidin masîgirî.” Wezîr wê weqtê [32b] hazır bû. Di guhê xwendekar ifade kir ku, “Ji bo masîyekî ev qeder diraf dayin minasib nîne.” Xwendekar jî cewab da ku, “Eger nedim cihê şermê ye. Lewra ku min emir kir, çawan dibe?” Wezîr got, “Minasib ew e ku ji masîgirî bipirsin ku, ev masîya nêr e weyanî mî ye. Eger bibêje, nêr e, ê mî ji wî bixwazin. Eger bibêje mî ye, ê nêr ji wî bixwazin. Masîgir hevala wê anîn, nikare bîne. Paşê îhsan jî naxwaze bibîne.” [33b] Xwendekar xebera wezîrî pesinî û ji masîgirî pirsîyar kir ku, “Eve masîya nêr e ya ne mî ye?” Masîgir cewab da ku, “Ev masîya xunsa<sup>22</sup> ye.” Xwendekar jî zehf kenî û ew sed rub’ye bi wî bexş kir.

### HIKAYETA HIVDEYÊ

Sûdager<sup>23</sup> çûne nik xwendekar û çend hesp nişan dan. Xwendekar zehf begen kir û kirî. Du sed hezar rub’ye zêde ji buhayê da sûdageran. Û emir kir ku, “Bişûve ji cihêd xo hespan bînin.” Sûdageran jî [34b] destûr bû rojekê. Xwendekar di halê mestî û serxoşî gote wezîrî ku, “Navêd hemû eblehan binivîs.” Wezîr ifade kir ku, “Berî niha min nivîsiye û di berê hemû navan navê hezreta we ye.” Pirsîyar kir û got, “Ji bo çi te du sed hezar rub’ye da sûdageran, ji anîna hespan bê kefil û bê zanîna cihêd wan? Eve ‘elametêd ehmeqîyê ye.’” Xwendekar got, “Eger sûdageran hesp anîn paşê çawan dikî?” Got, “Eger bînin, navê hezreta we ji deftera eblehan hek<sup>24</sup> dikim. Û navêd sûdageran li wê derê dixwazim binivîsim.”

### [35b] HIKAYETA HIJDEHÊ

Rojekê şâ’irekî qisûrekî kir. Xwendekar emrî celladî kir ku pêş ewî bikuje. Lerizîn bi endamê wî şâ’irî ket. Yaranek gote wî, “Ev çi namerdî ye û bê dili ye, ku qet ciwanê mîr wuha natirsin.” Şâ’ir got, “Ey nedîm, eger tu mîr i were li cihê min rûnê. Hetaez ji vir rabim.” Xwendekar ev letîfeya pesinî û kenî û ji qisûra wî borî.

### HIKAYETA NOZDEHÊ

Jinek diçû, mîrik ew dît û di pêy wê [36b] rewan bû. Jinik pirsîyar kir ku, “Ji bo çi di pêy min têyî?”. Got, “Li te ‘aşiq bûm.” Jinik got, “Li min çi ‘aşiq bûyî? Xweya min ji min rindtir e, ji pêyî min nêt. Here li wê ‘aşiq bibe.’” Ji wê derê zîvirî û jinekî kirêd eşkal dît. Zehf ne xoş bû. Di paşê bişûve hate nik wê û got,

20 Ji qat'a ya Erebî tê û bi wateya “Teqez û qet” tê bi kar anîn.

21 Ji “Beğenmek” a Tirkî, anku “Ecibandın”, “Pejirandin”.

22 Nêrûmê. Nêremê.

23 Bazirgan. Ticcar.

24 Jêbirin. Malaştin.

“Çera te derew got?” Jinik got, “Te jî rast ne got. Eger tu ‘aşiqî min bûyayî, nik yekî dinê jî bo ci diçûyî?” Şermî bû.

### HIKAYETA BÎSTÊ

Ji bo kuzekî<sup>25</sup> gotin, “Dixwazî pişta we rast bibe? [37b] Weyanî pişta merifê dinê jî hemû wekî pişta we kûz bibe?” Got, “Dixwazim ku pişta merifê dinê hemû kûz bibin. Wekî bi wî çavê ku ewan ez didîtim, ez jî ewan bibinim.”

### HIKAYETA BİST Ú YEKÊ

Merifek her rojê şeş nan dikirî. Rojekî dostekî ji wî pirsîyar kir ku, “Şeş nanan her rojî ci dikî?” Got, “Nanevêrîm û nanekî davêjim û du nanan bişûve dihêlim û du nanan jî bi deyn didim.” Wî dostî got, [38b] “Xebera te qet fehm nakim. Safî bibêje.” Got, “Nanê ku didêrim dixom û nanê ku davêjim bi xwestegan didim û du nanê ku bişûve dihêlim bi bab û dayê xo didim û du nanan jî bi kurrêd xo didim.”

### HIKAYETA BİST Ú DUYÊ

Emîr Teymûr wekî çû Hindîstanê û gîha, mitrib teleb kirin û got, “Min ji mezinan bihîstîye ku, di vî bajêrî mitribêd qenc hene.” Mitribekî nabeyna xwendekar hazır bû û dest bi istiranê kir. Xwendekar zehf xoşhal bû û navê [39b] wê pirsîyar kir. Got, “Navê min Dewlet e” Xwendekar got, “Dewlet jî kor dibe?” Ewî cewab go, “Eger dewlet kor nebûya leng nedihatî mal.” Xwendekar ev cewaba pesinî û zehf ihsan li wî kir.

### HIKAYETA BİST Ú SÊ

Merifek çû nik hekîmî û got “Zikê min dêse, derman bike.” Hekîm pirsîyar kir, “Îro te ci xorîye?” Got, “Nanê şewitî” Hekîm xwast ku derman di çavê bike. Ewî merifi got, “Ey [40b] hekîm, êşa zikê digel çavan ci nîsbet heye?” Hekîm got, “Berê lazim e dermanê çavan li te kirin. Eger çavê te (dirist)<sup>26</sup> bûya te nanê şewitî ne dixor.”

### HIKAYETA BİST Ú ÇARÊ

Rojekê xwendekar ji şâ’irekî êşa. Emrê celladî kir ku, “Li pêşî min bikuj.” Cellad çû ji bo şîr anînê. Şâ’ir gote haziran, “Çend sîlleyekan li min bidin, hetaşîr tête anîn ku xwendekar xoşhal bibe.” Xwendekar kenî û qisûra wî bexşî.

### [41b] HIKAYETA BİST Ú PÊNCÊ

Şâ’irekî, maldarek pesinî. Qet tiştek nedî. Paşê hicw û zemm<sup>27</sup> kir. Maldar qet tiştek negot. Roja dinê şâ’ir çû ber deriyê wî rûnişt. Maldar got, “Ey şâ’ir, te medh kir, min qet tiştek neda te û hicw kirî. Min qet tiştek negote te. Niha çima li vê derê rûniştî?” Got, “Niha ci dixozi?” Got ku, “Eger bimirî şîna te bibêjim.”

25 Xûz. Qenbûr.

26 Ev kelîme bi şasî nehaftye nivîsandin, lê di metnê Farsî de heye.

27 Gotina eyb û qisûrên yekî. Rexnekirin.

## HIKAYETA BİST Ü ŞEŞÊ

Xwendekarek di xewa xo da dît ku, hemû diranêd wî ketine. Ji mi'abbirek<sup>28</sup> te'bîra wê [42b] pirsîyar kir. Got ku, "Ewlad û xizmêd xwendekar, rûbirûyê xwendekar dixwazin bimirin." Xwendekar 'errinî û mi'ebbir hebs kir. Û mi'ebbirê dinê xwast û te'bîra wê xewnê pirsîyar kir. Îfade kir ku, "Ji hemû ewlad û xizman xwendekar dê zêde bijî." Xwendekar ev nikte pesinî û zehf ihsan da.

## HIKAYETA BİST Ü HEFTÊ

Merifek rutbeyekî mezin peyda kir. Ji boy mubarekî dostek çû nik wî. Ji wî merifi pirsîyar kir ku, "Tu kî yî û tu ji bo ci hatî?" [43b] Ew dost şermkirî vegerîya û got, "Tu min nas nakî, dostê te yî kevin im. Ji bo serxoşî hatim nik te. Minbihîst ku kor bûyi."

## HIKAYETA BİST Ü HEŞTÊ

Xwendekarek di şerê da şikest, revî. Merifek ji tayîfa dijminan ew girt û nas ne kir ku ew xwendekar e. Tedarîka xo da wî û ew gîhande cîhê wî. Paşê qederek birinc da wî ku bipêje. Û bi xo xwendekar zehf birsî bû. Birinc kire kolozê<sup>29</sup> û danî sere agirî. Û bi xo jî serê agirî rûnişt. Seyek hat [44b] û koloz girt û revî. Xwendekar kenî. Ew merif bi xwendekar 'errinî û got, "Ey ebleh, seyê kolozê te bir, tu dikennî. Bibêje sebeb ci ye." Xwendekar bê deng bû. Wekî qemçî dît got, "Rojekî wusan bû ku her ci weqtê biçûma nêçîrê sed dewe tedarîka min aşxana min digel min dibir. Îroje wusan heme ku mistek birinc jî seh nehêla." Ew merif 'ozra xo xwast û borî.

## HIKAYETA BİST Ü NEHÊ

Rojekê teyrek li ser darekê rûniştî bû. [45b] Xwendekar ewê dî û gote hâziran ku, "Evê bi tîr dixawazim bikujim." Tîr û kevan girt û avêtê. Tîrê xelet kir. Teyr fîrî. Xwendekar zehf şermî bû. Merifek boyî def'a şerma wî got, "Bigerim ku xwendekar li ser kuştina wê qadir bû, lakin ne xwast ku bikuje. Rehm li canê wê kir. Bi xo xelitand."

## HIKAYETA SÎYÊ

Merifek tûtiyek<sup>30</sup> xoyî kir. Û zimanê Farsî boyê te'lîm û hûrî kir. Tûti di ce-waba her xeberê digot, "Di vê ci şibhe!" Rojekê [46b] ewî merifi tûti ji boyî firoştinê bire sûqê û sed rub'îye jî buhayê wê birrî. Moxolek ji tûtiyê pirsîyar kir ku, "Tu layiqî sed rub'îye heyî?" Got "Di vê da ci şibhe!" Moxol xoşnûd bû û tûti kîrrî û anî mala xo. Her xeber ku digel tûti dida, digot ku, "Ci şibhe!" Moxol di dile xo da şermî û peşîman dibû. Û got, "Min ehmeqî kir. Wuha tûtiyek kîrrî." Dîsan tûti got, "Ci şibhe!" Moxol kennî û tûti jî azad kir.

28 Kesê ku te'bîra xewnan dike.

29 Kûzik. Cer.

30 Papaxan.

## [47b] HIKAYETA SÎ Ü YEKÊ

Rojekê xwendekar digel şehzadeyî çûne nêçîrê. Wekî hewa germ bû. Xwendekar û şehzade cilêd xo danîne ser milê qeşmerî. Xwendekar kenî û got, “Ey qeşmer, li ber te barê kerekî heye.” Qeşmerî got, “Belkî barê du keran e.”

## HIKAYETA SÎ Ü DUYÊ

Qeşmerekî digel jina xo nêzûkayî kir. Paşî çar mehan jina wî kurrek za. Gote mîrê xo, “Navê vî kurrî dixozî ci daynî?” Got, “Peyk<sup>31</sup>, lewra ku rêya neh mehan di çar mehan da birrî.”

## [48b] HIKAYETA SÎ Ü SÊYÊ

Melayek di mizgevtê da digel merifan we’z digot. Merifek di wê meclisê her rojê digirîya. Rojekê mela got ku, “Xeberêd min di dilê wî merifi zehf eser dike. Ji boy vê sebebê digirî.” Merifê dinê gotine wî merifi ku, “Xeberê mela di dilê me qet eser nake. Dilê te çawan e ku tu digirî?” Got ku, “Li ber xeberê mela nagirîm. Belkî min tekeyek xoyî kiribû. Û zehf min diva. Wekî teke pîr bû û mir. Her ci weqtê ku mela xeber dide [49b] û rihê wî dilepite teka min tête bîra min. Lewra ku ew jî rîha wuha dirêj didêra.”

## HIKAYETA SÎ Ü ÇARÊ

Merifekî şasa<sup>32</sup> feqîrekî istand û revî. Feqîr çû qebrîstanê û rûnişt. Merifan gotine wî ku, “Ew merif şasa we bi kenarê rezan bir. Tu di qebrîstanê ji bo ci rûniştî û ci dikî?”. Got ku, “Ew jî axirê dixoze bête vira, lewra li vê derê rûniştime.”

## HIKAYETA SÎ Ü PÊNCÊ

Xwendekarek digel wezîrê xo xurme dixor û dendikê [50b] xurmâyê diavête nik wezîrî. Paşî xorinê gote wezîrî, “Tu zehf xora yî. Lewra ku zehf dendikê xurman li pêşî we ketine.” Wezîr got, “Na, xwendekar zehf xorayî. Ne dendik hiştine û ne xurma.”

## HIKAYETA SÎ Ü ŞEŞÊ

Rojekê Îskender gote haziran, “Qet kesekî min mehrûm nekirîye. Her kesek ku tiştek ji min ci xostîye min bexşîye.” Merifek wê weqtê ifade kir ku, “Ey xwendekar ji bo min dirhemek lazim tu îhsan bike.” Emir kir ku, “Ji xwendekaran tişte edna<sup>33</sup> xwastin bê edebî ye.” [51b] Ewî merifi got, “Eger ku ji xwendekaran ji dayina dirhemekê şerm têtin, milkê welatekî bibexş.” Îskender got, “Berê te kêm ji merteba min xwast. Û paşê jî te zêde ji merteba xo ji min xwast. Di her du xwastinan jî bê mehel bûyî.” Ew merif bê cewab şermî bû.

31 Peyamber. Xeberdox.

32 Şaşık. Serpêç.

33 Asta gelekî nizm.

## HIKAYETA SÎ Û HEFTÊ

Xwendekarek ji qesmerekî êşîya. Emir kir ku, “Bavêne binê pîyê filê.” Qesmer jî zarî kir ku, “Ey xwendekar, ez ze’if im. Layiqî binê pîyê filê nînim. Min bavêje bin pîyê ‘efûyê. Wezîr bavêje binê pîyê filê. Lewra wezîr [52b] qelew e. Hestikêd wî di bin pîyê filê jî naxoze di piyan biçe.” Xwendekar bi kenarê wezîrî fikirî û kenî û got, “Çi dibêjî?” Wezîr ifade kir ku, “Ji bo Xudê cirma vî heramzadeyî bibexş, û ger ne, min jî dixwaze bavêje belayê.” Ji xwendekarî xebera qesmerî û rîca wezîrî xoş hat û ji qisûra wî ‘efû kir û xelat bexşî.

## HIKAYETA SÎ Û HEŞTÊ

Şerekî û merifekî di xanekê da her duwan sûretêd xo dîtin. Merifi gote şêrî, “Dibînî ku şeca’eta insanî ku şêr zebûn kirîye. Şêrî [53b] got, “Ostayê wî benî adem e. Şêr osta bûya wekî wî nedibû.”

## HIKAYETA SÎ Û NEHÊ

Merifek çû nik katîbî û got, “Xetekê binivîs.” Got, “Pîyê min dêşe.” Wî merifi got, “Naxwazim bişînim cîhekê, wuha ‘ozran tînî.” Cewab da ku, “Ev xebera te rast e, lakin her çi weqtê ku ji bo kesekî nivîsarekê bikim ji bo xwanda wê min dixozin dibin kesekî dinê, nikare bixwîne bixeşî ji min, lewra dibêjîm.”

## [54b] HIKAYETA ÇİLÊ

Merifek nivîsarek dinivîsî. Û merifek bîyanî jî li nik wî rûniştî bû. Di kenarê nivîsare didî. Ewî merifi di nivîsarê da nivîsî ku, “Merifekî bîyanî û ker li nik min rûniştîye û nivîsarê jî dixone. Ji bo vê sebebê qet sirrekê nanivîsim.” Ewî merifi got, “Çira min ehmeq zen dikî û çira sirran nanivîsî? Min nivîsara we ne xondîye.” Nivîsende got, “Eger te nivîsara min ne xondîye, bi çi me'lûm kir ku min wuha nivîsiye?”

## HIKAYETA ÇİL Û YEKÊ

Rojekê bazı gote dîkî ku, “Zehf [55b] bê wefa yî, merif te xoyî dikin û ji bo te xanî çêdikin. Wekî dixwazin ku te bigirin çira tu direvî? Eger çi ez teyrê bejî me, lakin çend rojekê ku ji destê merifan loqme dixom, ji boy wan nêçîrê dikim. Û her çiqasî ku dûr jî biçim, wekî gazî dikin bişûve dîsan têm.” Dîkî cewab da ku, “Te qet baz li serê şîşê dîye, min zehf dîk li ser şîşê kebab dîye. Û zehf dîk li ser agîrê biryan dîye. Tu jî zehf dûr direvî, eger bazekî li ser şîşê bibînî.” Baz bêcewab bû.

## [56b] HIKAYETA ÇİL Û DUYÊ

Melayek nedîmê xwendekarekî bû, ku mû û rihê xo dikêşand. Rojekê xwendekar gote wî, “Eger rojekê dinê jî tu mû û rihê xo bikêşîne dixozim siyaset li te bikim.” Paşî çend rojekan mela şuxlek kir ku xwendekar zehf li ber wî mi-hebbet bû û gote wî ku, “Her çi ku bixozî dê bibexşînim te.” Mela got ku, “Rihê

min bibexşîne. Min bi xeyr ji wê qet nexwazim.” Xwendekar kennî û got, “Eger xoşîya te di vê da ye min bexşî.”

### **HIKAYETA ÇİL Ü SÊYÊ**

Kirêdrûyek çû nik hekîmekî [57b] û got ku, “Li ber kirêdtirî cîhekî min pizûkek hatîye, dermanekê bide.” Hekîm li rûyî flîkir<sup>34</sup> û got, “Derew dibêjî. Rûyê te dibinim, li wê qet pizûk nîne.”

### **HIKAYETA ÇİL Ü ÇARÊ**

Merifekî gote xulamê xo ku “Sûbeyê zû eger qijikê li cîhekê rûniştî dibînî, ji me ra xeber bike ku ez dixwazim bibînim û kîfekî xoş dixozim bibînim.” Temamê wê rojê bixoşî dixoze bibore. Hasilî, xulam du qijik dî bi hev ra. Xeber da axayê xo. Axayê wî wekî biderve hate der. [58b] Qijikek dît, qijika dinê jî firî bû. Zehf li xulamî ‘errinî û bi qemçî lêdan girt. Hema wê weqtê dostekî ji boy wî zad verêkir. Xulam anî û nîşan da ku “Ey axa, te qijikek dî, ji bo te te’am hat. Eger te du qijik bidîya te jî ew didî ku min dît.”

### **HIKAYETA ÇİL Ü PÊNCÊ**

Hekîmek her çiqas ku dicû qebrîstanê çarik<sup>35</sup> li serê xo digirt. Merifan ji wî pirsîyar kir ku, “Çi sebeb e?”. Got ku, “Ji merifêd qebrîstanê şerm dikim. [59b] Lewra ku ji dermanê min mirine.”

### **HIKAYETA ÇİL Ü ŞEŞÊ**

Rojekê xwendekarekî zalim bitenê ji bajêr bi derive çû. Merifek li binê darekê rûniştî dît. Pirsîyar kir ku, “Xwendekarê vî milkî çawan e? Zalim ya ‘adil e?” Got, “Zehf zalim e.” Xwendekar got, “Min dinasî?” Got, “Na” Xwendekar got, “Ez im xwendekarê vî milkî.” Ew merif tırsîya û got, “Tu jî min dinasî?” Xwendekar got, “Na.” “Kurrê filan bazirganî me. Her mehê sê rojan dîn dibim. Îro yek [60b] roj e ji sê rojan.” Xwendekar kenî û qet negot.

### **HIKAYETA ÇİL Ü HEFTÊ**

Şa’irek çû nik maldarekî û zehf ew medh kir. Maldar jî zehf xoşhal bû û got, “Li nik min diraf nîne, lakin zewadê zehf eger sûbe bêyî didim.” Sha’ir çû mala xo. Weqtê fecrê bişûve hate nik bazirganî pirsîyar kir ku, “Ji boy ci hatî?” Got, “Dûhûnî te we’da dayina zewadê kir. Ji bo vê sebebê hatim.” Maldar got [61b] ku, “Ecêb ebleh î. Te ez ji xeberan xoş kirim. Min jî tu ji xeberêd xoş zahir kir. Niha zewade ji bo ci bidim?” Sha’ir jî şermî bişûve çû.

### **HIKAYETA ÇİL Ü HEŞTÊ**

Feqîrekî cirmekî mezin kir. Birine nik hebeşê kotûwal. Kotûwal jî hikim kir ku “Rûyê feqîrî reş bikin û di nêv temamê bajêr bigerînin.” Feqîr got, “Ey kotûwal,

34 Di wateya “nihêrin”ê de tê bi kar anîn.

35 Dersok. Şaşik. Kefî.

nîvê ruyê min reş bike û gerrîna hemû merifêd bajêr, dixwazin bizanin ku hebeşê kotûwal [62b] heme.” Kotûwal<sup>36</sup> ji vê xeberê kennî û qisûra feqîr bexşî.

### **HIKAYETA ÇİL Ü NEHÊ**

Korek di şevekî tarî da çira di dest û cerr<sup>37</sup> li ser milî girtî di sûqê diçû. Merifekî ji wî pirsîyar kir ku, “Ey ehleh, şev û roj di çavê te yek e. Ji çirayê ji bo te ci fayîde heye?” Kor kennî û got, “Ev çira ji boy min nîne. Hetadi şeva tarî tu cerrê min neşkînî.”

### **HIKAYETA PÊNCÎHÊ**

Feqîrek çû dikana beqalekî [63b] û di kirrîtinê lez kir. Beqal jî bi feqîrî çîr kirin da û feqîr ‘errimî û solek li sere beqalî da. Beqal jî çû nik kotûwal û nalî. Kotûwal jî ew feqîr xwast û pirsîyar kir ku, “Çira te beqal kuta?” Feqîrî got ku, “Beqal çîrrê min kir.” Kotûwal got, “Ey feqîro, te qisûrekî mezin kirîye, lakin feqîr i. Ji boy wê ji te ra sîyaset<sup>38</sup> nakim. Here heş hejîran bide beqalî. Ceza qisûra te ev e.” Feqîrî rub’îyeyek ji kûrika<sup>39</sup> xo bideranî û bi [64b] destê wî destê kotûwalî û solekê jî li sere kotûwal da û got, “Eger ‘edil ev e heş hejîran tu bistîne û heş hejîran jî bide wî.”

### **HIKAYETA PÊNCÎ Ü YEKÊ**

Misewwirek<sup>40</sup> çû bajarekî û li wê derê dest bi hekîmîyê kir. Paşî çend rojekê merifek ji wetenê wî hate wî bajarî û ew dît û pirsîyar kir ku, “Ev ci hal e dikî?” Got ku, “Hekîmî.” Pirsîyar kir, “Ji boy ci?” Got, “Ji boy wê ku, eger di vê pîşeyê da qisûrekê bikim xwelî wê setir<sup>41</sup> dike.”

### **[65b] HIKAYETA PÊNCÎ Ü DUYÊ**

Şa’irekî feqîr çû nik maldarekî wusan nêzûkî wî rûnişt ku mabeyna şâ’irî û maldarî ji bostekê zêde nebû. Maldar jî ji boy wê sebebê ‘errinî<sup>42</sup> û rûyê xo jê tîrs kir. Û pirsîyar kir ku, “Di mabeyna te û kerê ci ferq heye?” Got ku, “Bi qederê bostekê.” Maldar ji vê xeberê zehf şermî bû û ‘ozir xwast.

### **HIKAYETA PÊNCÎ Ü SÊYÊ**

Sûalkerek çû biderê maldarekî [66b] û sual kir. Ji hunduro malê jî cewab hat ku, “Sîte<sup>43</sup> di mal da nîne.” Sûalkerî got, “Parîkî nanî min súal kir, min sitê ne xwast ku eve cewabê didî.”

36 Hakim, Dadger. Kelîmeyeke Farsî ye, ku di heman deme de di wateya “hikimdar” de jî tê bi kar anîn.

37 Kûz. Şerbik.

38 Di wateya “cezakirinê” de tê bi kar anîn.

39 Çaket. Kaput. Sako

40 Ressam. Wênesaz.

41 Veşartin. Nepenîkirin.

42 Sil bûn.

43 Jin. Xanim.

## HIKAYETA PÊNCÎ Û ÇARÊ

Xwendekarekî melayekî gazî kir û got, “Dixozim ku te bikim qazîyê vî bajarî.” Melayî got, “Ez layiqî vî şixulî nînim.” Pirsîyar kir ku, “Çira?” Cewab da ku, “Ewê ku min got eger rast e min me’zûr bidêre, û eger ne, min derew gotîye. Paşê, merifê derewîn qazîkirin layiq nîne.” Xwendekar [67b] ‘ozra melayî qebûl kir û ew me’zûr dêra.

## HIKAYETA PÊNCÎ Û PÊNCÊ

Rojekê mîrekî tîr diavête armacê<sup>44</sup>. Li wê derê zehf amaçcî jî hazir bûn. Tîra kesekî ne digîha amacê. Feqîrek çû wê derê û ji mîr tiştek xwast. Mîrî, tîrê kevanê xo da destê feqîrî û got, “Biavêje armacê û lê de.” Feqîrî jî tîr havête amacê rast-gele lê da. Mîr zehf kîfxoş bû û sed rub’îye bexşî feqîrî û destûr da. Feqîrî gote mîrî, “Min sûal kir qet te ne da.” [68b] Mîr rûyê xo kêşa û got ku, “Sed rub’îye min bi te bexşî, dibêjî min tiştek nedî. Ev ci xeber e?” Feqîrî got, “Sed rub’îye armacê lê da min, girt û ji sûalê min ci dît?” Kenî û ihsenekî dinê bexşî.

## HIKAYETA PÊNCÎ Û ŞEŞÊ

Şevezê qazî di kitêbê da dî ku her ci ku serî biçûk û rih dirêj bidêre ew jî ehmeq dibe. Qazî jî ser biçûk û rih jî zehf dirêj bû. Digel xo got ku, “Serî biçûk kirinê nikarim, lakin rihê kurt kirinê dikarim.” Meqes jî anî [69b] di kirmêkirinê ne dî. Naçarî nîvê rîyan di dest xo girt û nîvê berê nikê çirayê wekî şemalê girte mûyan. Germî gîha destêd wî. Rîhê xo berda. Hemû jî rihê wî şewitî. Qazî jî zehf şermî bû, bi sebebê wê ku her ci di kitêbê da bû, sabit bû.

## HIKAYETA PÊNCÎ Û HEFTÊ

Rojekê xwendekarek li ser banê qesra xo rûniştî bû. Merifekî dît ku li binê dîwêri rûniştîye, teyrek di dest girtîye nîşan dide. Xwendekar ew teleb kir û pirsîyar kir, [70b] “Ji boy ci teyrê nîşanî min didî?” Got, “Ey xwendekar, digel merifekî ji kenarê hezreta we min şert kir û ev teyre di leyze da ji boy xwendekar min anî. “Xwendekar şa bû û teyr jî şande aşxanê. Û paşî du û sê rojan ew merif dîsan bişûve hate nik xwendekar û bizek anî nik xwendekar û got, “Ji navê hezreta we ew jî di leyze da min dî.” Xwendekar ew jî wuha qebûl kir. Cara sêyê dîsan çû nik xwendekar û merifekî dinê digel xo bir. Wekî xwendekar ew dest-vala dî pirsîyar kir ku, “Te ji boy min qet ne anîye?” İfade kir ku, “Jî kenarê hezreta we digel vî merifi [71b] du hezar rub’îye şert kirime û leyiz jî ne hate min. Niha ev merifa ji boy zêran hatîye hezreta we.” Xwendekar kenî û zêr bexşîne wî. Û emir kir ku, “Paşê ji kenarê min digel kesekî qumarê melîze. Deha qet ji te naxozim bigirim û ne tiştekê jî bi te nadim.”

44 Hedef.

## HIKAYETA PÊNCÎ Û HEŞTÊ

Merifekî di xewnê da digel Iblîs milaqat kir. Sîleyekê li rûyê wî da û rihê wî girt û got, “Ey le’în, tu dijminê min ï û ji boy xarandina me merifan rih dirêj didîrî.” [72b] Û sîleyekî dinê li rûyê wî da. Hişyar bû û rihê xo di destê xo da dî. Şermî bû û li ber xo kenî.

## HIKAYETA PÊNCÎ Û NEHÊ

Merifek çû nik derwêşekî û sê súal kirin. Ê berê ew ku, “Çira dibêjî ku Xudêyê me li hemû cîhan hazır e, qet li cîhekî nabînim. Nîşan bide li ku ye.” Ê duyê ew ku, “Ji boy benî ademan ji boy teqsîre çira siyaset dikin? Her çi dike Xudê dike. Ji boy benî ademî qet quđret nîne. Û bê emrê Xudê qet nikare bike. Û eger quđreta benî ademî bûya hemû şixulan ra jî [73b] ji boy xo çêtir dikir.” Ê sêyê ku, “Xudê bi Iblîsî agirê dojeyê çawan dikare ‘ezeb bide, ku Iblîs ji agirê kirîye? Û agir jî li agirê çi eser dixoze bike. Lewra ku eslê wî ji agirê ye. Û agir di agirê çi eserê dixoze bike?” Derwêş kêsekekî mezin li serê wî da û merif bi girî çû nik qazî û got, “Ji filan derwêş min sê súal kir, li serê min wusan kêsekek lê da ku serê min dêşe û cewab neda.” Qazî jî derwêş teleb kir û got, “Çira te kêsekek li serê vî da û cewaba súala wî ne da?” Derwêş go, “Ew kêsekek hemîn cewaba súala wî bû ku min da. [74b] Ewe dibêje ku, serê min diêşe. Bilanî nîşan bide ku li kîderê ye. Ejî Xudê nîşanî wî bidim. Û ji boy çi li nik hezreta we nalî? Her çi ku li wî kirîye, Xudê kirîye. Min bê iradeta Xudê li wî ne da. Ji boy min çi quđret heye. Bê irade lê dan. Û ew jî bi xo ji xwelîyê ye. Bes ji xwelîyê ew çawan zererê dibîne?” Ew merif şermî bû û qazî cewaba derwêşî zehf meqbûl dêra.

## HIKAYETA ŞESTÊ

Siwarek hate bajêrekî û bihîst ku li wê derê diz zehf in. Weqtê şevê gote mîterî<sup>45</sup>, “Tu razê, ez dixozim ku hişyar bimînim. [75b] Lewra bawerîya min bi te nîne. Mîterî got, “Ey axa, ev çi xeber e. Ez begen nakim ku ez di xewê da bim û axayê min hişyar be. Ez esla wuha nakim.” Hasilî, axayî raza û paşî miqdarekê şevê hişyar bû gote mîterî, “Çi dikî?” Got, “Di fikrê da me ku Xudê ‘erd çawan li ser evê raxist.” Got ku, “Ditirsim ku diz bêñ û tu xeberdar nebî.” “Ey axa, tu rahet be. Ez xeberdar im.” Ew siwar dîsa raza û nîvê şevê hişyar bû û pirsîyar kir ku, “Ey mîter çi dikî?” Got ku, “Di fikrê de me ku Xudê ‘esman çawanî [76b] bê istûn daye sekinandinê.” Got ku, “Ji fikra te ditirsim. Mebe ku diz hespê me bibin?” Got ku, “Ey axa, hişyar im, çawanî diz dikarin bibin?” Siwarî got, “Eger razanê dixozî razê. Ez hişyar im, tu dixozî razê.” Got, “Xewa min nayê.” Siwar dîsan raza. Wekî sa’etek ji şevê ma hişyar bû û ji mîterî pirsîyar kir ku, “Çi dikî?” Got, “Di wê fikrê me ku dizan hesp birîye sûbe zînî ez li ber serê xo dê bibim, yanî axa dibe.”

45 Seyîsê hespan.

## HIKAYETA ŞÊST Ú YEKÊ

Derwêşek çû nik bexîlekî<sup>46</sup> û tiştek jê sûal kir. Bexîlî got, “Eger xeberekê ji [77b] ji min qebûl bike her ci bibêjî dixozim bikim.” Derwêş pirsîyar kir ku, “Ew xeber ci ye?” Got, “Tiştekê ji min mexoze bi xeyr ji wê, her ci dibêjî bikim.”

## HIKAYETA ŞÊST Ú DUYÊ

Mirofekî digel bexîlekî dostî hebû. Rojekê gote bexîlî ku, “Niha diçim seferê. Xatema<sup>47</sup> xo bide min. Ewê digel xo dixozim hifz bikim. Her ci gava ku ewê dibînim te tînim bîra xo.” Cewab da ku, “Eger dixozî min bînî bîra xo, her ci gava ku tilûya xo vala dibînî min bîne bîra xo ku ji filanî min xatem jê [78b] xwastibû û ne dayîbû.”

## HIKAYETA ŞÊST Ú SÊYÊ

Melayek çû bajarekî bihîst ku di wî bajêrî merifekî xoyî sexawet<sup>48</sup> zehf didêre û zad dide mîvanan. Mela jî digel parçenê kevin û perîşan çû nik ewî merifi. Qet guh ne da û cîhê rûniştinê jî neda. Mela şermî bû û bişûve hat. Roja dinê lîbasnê qenc û paqîj bi kirê girt û ragirt, çû nik wî. Xoyê malê îkram kir û li nik xo danî. Ü zadê bilezzet ji boy wî xwast. Mela ku li ber zadî rûnişt parî jî li ber lîbasêd xo soyin<sup>49</sup> girt. Paşê [79b] xoyê malê pirsîyar kir ku, “Çiranî wuha dikî?” Got, “Dihûnî jî digel lîbasêd kevin ez hatibûm. Qet zad min ne dî. Îro ku digel lîbasêd qenc hatim, ez zen dikim ku ev zada ji boy van parça ne, ne ji boy min e.” Ew merif şermî bû û ‘ozr xwast.

## HIKAYETA ŞÊST Ú ÇARÊ

Xwendekarek tabûrek şehandê<sup>50</sup> bir serê dijminan. Ew tabûr şikest dî. Merifekî çelenk hat enik xwendekar û xeber anî ku, “Tabûra we qenc û zefer dî.” Paşî du rojan cewab hat ku bi ‘eks bûye. Xwendekar li wî merifi sîyaset kirin xwast. İfade kir ku, [80b] “Ey xwendekar, ez sezayî sîyasetê nînim. Lewra ku du rojan min tu şad kir. Tu çira min nexoşî dikî.” Xwendekar ev letîfe begen kir û ihsan emir kir.

## HIKAYETA ŞÊST Ú PÊNCÊ

Xwendekarek ji mineccimekî pirsîyar kir ku, “Çend sal ji ‘emrê min baqî maye?” Got, “Deh sal.” Xwendekar zehf milahaze kir. Wekî nexoşan kete ser doşekê. Wezîr pirsîyar kir. Zehf ‘aqîl bû. Mineccim jî rûbirûyê xwendekar teleb kir û pirsîyar kir ku, “Çend salan ‘emrê te baqî ye?” Got, “Bîst salan.” Wezîr heman wê weqtê [81b] bi şûrî li nik rûyê xwendekar ew mineccim qetil kir.

46 Çavnebar. Kumreş. Qesîs.

47 Gustîl.

48 Comerdî. Camêrî. Çavfireyî.

49 Tê de kirin. Tê ra kirin.

50 Leşker.

Xwendekar xoşnûd kir. Û hikmeta wezîr pesinî û paşê xebera qet mineccimekî ne bihîst.

### **HIKAYETA ŞÊST Û ŞEŞÊ**

Merifek birsî diçû, ‘Erebekî dî ku li ber kenarê hewizekê zad dixo. Çû nik wî û got, “Jî terefê mala we têm.” ‘Erebî pirsîyar kir ku, “Jin û zaro û deveyêd min hemû jî silamet in?” Got, “Belê.” Ji ‘Erebî tesellî bû. Û paşê li wî merifi nihêrî û got, “Ey ‘Ereb, ev seja ku li hizûra te niha rûniştiye eger [82b] seyê te xoş bima-ya wuha dibû.” ‘Erebî serê xo bi jor ve kir û got, “Seyê min ji boy ci mir?” Got, “Goştê deveyê te zehf xwar.” Got ku, “Deve çawanî mir?” Got ku, “Jina we mir, wê sebebê kesekî ew xoyî ne kir û xurek û av ne da.” Pirsîyar kir ku, “Jina min çawanî mir?” Go, “Di xema kurrê te zehf girî û kevir li sere xo û sîngê xo da.” Pirsîyar kir ku, “Kurrê min çawanî mir?” Got, “Xanî li ser wî ket.” ‘Erebî wekî ev ewhala xanî xebera bihîst, xolî li serê xo kir û zad jî wusanî hêla û bi kenarê mala xo jî rewane bû. Ewî merifi jî [83b] bi vê hikmetê te’am bi destê xo kir.

### **HIKAYETA ŞÊST Û HEFTÊ**

Bexîlekî gote dosteki ku, “Hezar rub’îye li nik min heye. Dixozim ku evan rub’îyeyan bi derî bajêr çal bikim û bi xeyr ji te evî sirrî nabêjim.” Hasilî, ew her du bider ve çûn û di binê darekê da diraf çal kirin. Paşî çend rojekan bexîl bi tenê hate binê darê. Ji dirafê qet eser ne dî. Got ku, “Bi xeyr ji wî dostê min kesekî dinê ne birîye, lakin eger ji wî bipirsim esla îqrar nake.” [84b] Paşê çû mala wî û got, “Zehf diraf bi dest min ketîye. Ez dixozim ku wuhanî li wê derê daynim, lakin eger sûbê bêyî digel hev biçin.” Dostê bi tema’â dirafê zehf, ew dirafê birî li wê derê bişûve bir danî. Bexîl roja dinê bi tenê çû wê derê û dirafê xo dît. Hikmeta xo bi ken kir. Û paşê li ber dostîya dostan bawer nekir.

### **HIKAYETA ŞÊST Û HEŞTÊ**

Du neqqaşan digel hev gotin ku, “Em her du, du sûretan teswîr bikêşim bibînim kîjan qenc dikêşe?” Misewwirekî oşiyekî<sup>51</sup> tirî neqş kir [85b] û ew li ber derê wî hilawist. Teyran hatin û li wê mînqar lê dan. Merifan ew suret jî zehf begen kirin. Û çûne mala misewwirê dinê û pirsîyar kirin ku, “Li kî derê te suret kêşaye?” Got, “Di pişt vê perdeyê.” Misewwirê berê xwast ku perdeyê hilîne. Wekî destê xo bir ku perdeyê bibîne me'lûm kir ku perde nîne. Belku dîwar e ku li ser wê sûret kêşaye. Misewwirê dinê got ku, “Te wusan suret kêşaye ku teyr xapîyane û min wusa sûret kêşaye ku misewwir xapîyabe.”

### **HIKAYETA ŞÊST Û NEHÊ**

Rojekê merifekî digel xo got ku, “Her ci ku [86b] ‘erd û asman e, hemû ji boy min e. Xudê ez zehf mezin xelq kirime. Li wê navê kermûsek li ber kepê wî

51 Goşî. Weşî. Hûşî.

rûnişt û got, “Ji te ra wuha xirûr layiq nîne, lewra ku her çi di ‘erd û esmanê da ye, Xudê ji boy te xelq kiriye. Tu jî ji boy min. Nizanî ku ji te mezintir im.”

### HIKAYETA HEFTÊ

Xwendekarekî emrî heddadek<sup>52</sup> kir ku, “Zirhekî qenc ji boy min hazir bike.” Heddadî jî hazir kir anî nik xwendekar. Xwendekar jî bi meqseda tecribeyê danî ‘erdê [87b] û şûr li wê da, du ker bû. Emrî heddadî kir ku, “Eger paşê dîsanî wuha zirh dixozî çêkî, serê te jî dixozim du keran bikim.” Heddad çû mala xo. Keçek hebû, ev ewhala jî digel wê got. Keçikê jî wuha meslehet<sup>53</sup> dît ku, “Dîsan zirhê çêke. Vê carê ez dixozim ku bibim nik xwendekar.” Hasilî, heddad zirh çêkir. Ü keçika wî ew zirh wergirt û şûrek jî di dest girt û çû nik xwendekarî û ifade kir ku, “Niha li zirhê bifikirin.” Xwendekar, “Ji boy çi te eva wergirtîye?” Got, “Ey xwendekar izin bide. [88b] ‘Adet ew e ku zirh li ser wicûdê tête tecribe kirin. Ji boy vê sebebê min wergirtîye.” Xwendekar ev xebera bi ken kir û îhsan bexşî.

### HIKAYETA HEFTÊ Û YEKÊ

Rojekê xwendekarek digel wezîrê xo ji boy seyranê çû. Gîhane mezrayekê darêd genimê dî ku ji bejna benî ademan dirêjtir. Xwendekar ‘ecêb ma û got, “Wuha dirêj qasilê<sup>54</sup> genimê wekî bejna filê bilind û dirêj dibin?” Xwendekar kenî wezîr digel xo got ku xwendekar [89b] xebera wî bi derew zen kir lewra ku kenî. Wekî ji seyranê bişûve hatin mektûb bi merifê welatê xo ji boy çend qasîlê genimî hatin û şandinê verêkir. Mektûb gîha wê derê. Weqtê genimî borî bû. Hasilî, paşî salekê qasilêd genimî ji wê derê jî gîhîsttin. Wezîr bire pêş xwendekar. Xwendekar jî pirsîyar kir ku, “Çira te anî?” İfade kir ku, “Sala borî rojekê min ifade kiribû ku qasîlê genimî weku bejna filan bilind dibin. Hûn kenîn, Min digel xo got ku, xebera min we derew zen kirin. Ji boy tesdîqa xebera xo min anî.” Xwendekar got, “Niha [90b] min bawer kir, lakin emanet li ber kesekî wuha xeberan nebêje ku paşî salekê bawer bike.”

### HIKAYETA HEFTÊ Û DUYÊ

Dizek ji boy dizîna hespekê çû cîhê merifekî. Rastgele ew hate girtin. Xoyê hespê gote dizî, “Eger hikmeta dizîyê hespê bi min hûrî bikî, ez te jî azad dikim.” Diz jî qebûl kir û çû nik hespê û ben ji istûyê wê vekir. Paşê wê gem kir. Paşê li hespê siwar bû û ajot û gote xoyî ku, “Bibîne wuha dizî dikin.” Merifan her çiqasî li pey çûn ne dîtin.

52 Hesinker.

53 Bejewendî. Fêde.

54 Qesîl. Giyayê genim û ceh yê teze yê ku hîn simbil negirtine.

## [91b] HIKAYETA HEFTÊ Ú SÊYÊ

Merifek zehf muflîs bû. Hespek jî hebû. Ew di pagê<sup>55</sup> da girêda. Lakin kenarê ku serê hespan dibe, dûvê wê bi wê terefê kir. Û dellal da gazîkirin ku, “Merifno temasayekî ‘ecêb bibinin, ku serê hespê li cîhê dûvê ye.” Hemû merifêd bajêrê berhev bûn. Her merifekî ku ji boy temasayê çû hundûroyê pagê, dixost ku ji wî qederekî diraf bistîne. Digirt û rê dida wî. Her ci kesekî ku diçû wê pagê, paşê şermîbûyî wuha ji wê pagê biderve dihatin. Û qet kesek jî ne digot, ku<sup>56</sup>.

## [92b] HIKAYETA HEFTÊ Ú ÇARÊ

Merifekî ji Eflatûn pirsîyar kir ku, “Salêd zehf di gemiyê bûyî û sefera behrê kirî. Di behrê da te ci xerayîb<sup>57</sup> dî?” Got, “Ev xerîb e ku ji behrê bi silamet bi kenarê gihîstîm.”

## HIKAYETA HEFTÊ Ú PÊNCÊ

Ji boy xwendekarekî wezîrekî ‘aqîl hebû. Destê xo ji wezîriyê kêşa û bi te’eta Xudê meşxûl bû. Xwendekar jî ji emîran pirsîyar kir ku, “Wezîr li ku ye?” İfade kirin ku, “Ji wezîriyê dest kêşaye, bi te’eya<sup>58</sup> Xudê meşxûl bûye.” Xwendekar çû nik [93b] wezîri û pirsîyar kir ku, “Ey wezir, ji min we ci qisûr dît ku wezaret te terk kirî?” Got, “Ji boy penc sebeban. Ewilî ew e ku, tu rûniştî bûyî ez li hizûra te li pîyan dimam. Niha xizmeta Xudê dikim ku di weqtê nimêjê jî izna rûniştinê daye. Ê duyê ew e ku, te zad dixor û min nezer dikir. Niha rezaqekî peyda kirim ku ew naxû û bi min dide xorin. Ê sêyê ew e ku, tu radizayî û min bekçitî dikir. Niha Xudêyekî didêrim ku ez radizêm û ew ji boy min bekçitî dike. Ê çarê ew e ku, dayîma ez ji te ditırsam. Eger tu bimirî ji boy min [94b] ji dijminan bela bigihêse. Niha wusan Xudêyekî didêrim ku naxoze bimire û ji boy min jî ji dijminan qet bela nayê. Ê pêncê ew e ku, ez ji te ditırsim ku eger ji min cirmek bêbe ne bexşî. Niha Xudêyekî heye ku wusanî bi rehm e ku her rojê sed gunehan dikim dibexşîne.”

## HIKAYETA HEFTÊ Ú ŞEŞÊ

Rîwayet dikan ku Siltan Mehmûd ji Ýaz zehf dost didêra. Ji vê sebebê hemû mûqrîban<sup>59</sup> ji wî hesed dibirin. Û gotine xwendekar ku, “Ýaz her rojê bi tenê diçe [95b] xezînexaneyê. Me'lûm dibe ku tiştekê didize. Eger wusa nebe ji boy wira di xezîneyê ci şixul e?” Xwendekar got, “Her gava ku ez bi xo bi çavê xo nebinim bawer nakim.” Rojekê dinê xeber dane xwendekar ku, “Ýaz çûye xezînexaneyê.” Xwendekar jî ji derîçeyê nezer li hundûroyê xezîneyê kir ku ci dibîne, ku Ýaz sîndoqek vekirîye cilekî kevin û jinde wergirtîye. Xwendekar çû

<sup>55</sup> Axur.

<sup>56</sup> Kî.

<sup>57</sup> Pirjimara kelîmeya xerab.

<sup>58</sup> Te’et. Perestin.

<sup>59</sup> Kesên nêzik. Heval û hogir. Xizm.

hundûro û pirsîyar kir ku, “Çira tu wuha lîbasê kevin wergirtîye?” Îfade kir, “Êy xwendekar, wekî li xizmeta hezreta we nebûm, min wuha lîbasê kevin didêra. Niha ji dewleta xwendekar parçenêd [96b] faxîre didêrim. Cilêd xoyî kevin ji her rojê dibînim wer dikim. Hetaku halê xoyî berê ji bîr nekim û qedrê ne’meta xwendekarâ binasim.” Xwendekar wekî ev cewab bihîst bi ken kir û ew êna nik xo û mertebeya wî mezin kir.

### **HIKAYETA HEFTÊ Û HEFTÊ**

Di exlaqê Erdeşîrê Babekan hatîye, ku ji hekîmekî ‘Ereb pirsîyar kir ku, “Her rojê ci miqdar zad lazim e xorin?” Got, “Sed dirhem kîfayet dike.” Got ku, “Ew qeder ci qewet dide?” Got, “Ew miqdar te lipêyan didêre û her ci ku ji wê [97b] zêde bikî tu hemalê wê yî.”

### **HIKAYETA HEFTÊ Û HEŞTÊ**

Yekî ji hekîman kurrê xo ji zehf xorinê men’ dikir ku, “Têrî, merîfî nexoş didêre.” Got, “Babo, bîrsîtî ji dikuje te, te ne bihîstîye ku gotine? Bi têrî mirin qenc e ku bîrsî bibî.” Got, “Endazeyê<sup>60</sup> hifz bike. Xudê gotîye, bixû vexû lakin îsrafê meke.”

### **HIKAYETA HEFTÊ Û NEHÊ**

Dest û pêbirê yekî hezar pê kuşt. Ehlûllahekî li wî borî û got ku, “Xudayê mezin, [98b] digel hezar pêyî ku hebû, wekî ecel hat gîha, ji bê dest û pêyekî nikare bireve.”

### **HIKAYETA HEŞTÊ**

Ji boy sûdagerekî hezar zêr zîyan bû. Gote kurrê xo, “Lazim nayê ku vê xeberê ji boy kesekî bibêjî.” Kurrî got, “Babo, emre te ye, nabêjîm. We lakin ji boy me ra ji wê ci fayîde. Li wê min metla<sup>61</sup> bike ku fayîde di xef kîrinê ci ye?” Babî got, “Heta ku bela me dudu ne be. Yek çûna malî û noqsaniya sermayeyê û şabûna dijminan.”

### **HIKAYETA HEŞTÊ Û YEKÊ**

Ji sha’iran yek çû nik mîrê dizan [99b] medh got. Emir kir ku, cilêd wî bistînin. Û ji gundî biderve kîrin. Seh ketine pê wî. Xwast ku kevirekî hilîne. ‘Erd ji cemidî bû. ‘Aciz bû got, “Ev ci heramzade merif in ku seh vekirine û ‘erd ji wuhanî girêdayine.” Mîr ji şibakê bihîst û kenî û got, “Ey hekîm, ji min tiştekê bixoze.” Got ku, “Cilê xo dixozim, eger ihsan dikî.”

### **HIKAYETA HEŞTÊ Û DUYÊ**

Merifekî çav êşî girt. Çu nik beytarî go, “Min derman bikî.” Beytar ji ji dermanê ku dikêşa çavê çarpêyan di çavê [100b] wî kêşa. Kor bû. Hikûmet bîrine pêş ‘edaletê got, “Here, qet nîne, eger ev ker nebûya ne diçû nik beytarî.”

60 Pîvan.

61 Hayidar kîrin. Qani’ kîrin.

## HIKAYETA HEŞTÊ Ú SÊYÊ

Xwendekarekî kurrê xo da me'limekî, ku eva kurrî wusanî terbiye bike ku wekî kurrekî ji kurrêd we bibe. Salekê li wî emek da û cîhê tiştekê ne girt. Û kurrêd melayî di fezlekemalê da muntehi<sup>62</sup> bûn. Xwendekar gazî mela kirî. Mû'axeze<sup>63</sup> kir û got, “Te we'da xo xilaf kir û şertê wefayê bi cî ne anî.” Got, “Ey xwendekar, terbiyet [101b] hemû yek e, we lakin qabiliyet mûxtelîf e.”

## HIKAYETA HEŞTÊ Ú ÇARÊ

Kurrê maldarekî min dî ku li ser qebra babê rûniştî ye û digel kurrê feqîrekî mûbahese<sup>64</sup> dikirî. Daîma ku tabûta babê min bi qîymet e û nivîsara wî rengin û kevirê mermer havêtine û acûr<sup>65</sup> ji fîrûzeyê çêkirine. Bi qebra babê te çawanî, dişibe ku acûrekî dû cem' kirine û mistekî du xolî li ser wê raxistîne.” Kurrê feqîrî evbihîst û got ku, “Sûs be! Heta babê te jî ji binê vî kevirê giran rabe û xo bibîne babê min jî digihêje bihiştê.”

### ENCAM

Mela Mehmûdê Bazîdî di warê ziman, edebîyat û çanda Kurdî de xizmetên giranbuha kiriye. Girîngîya Mela Mehmûdê Bazîdî yê zana û piralî encax piştî ku zêdeyî sed û pêncî sal derbas bûye, yanâ iroj tê famkirin. Her ku berhem û kiryarêñ wî dibin mijara lêkolînêñ zanistê, careke dinê derdikeve holê ku Bazîdî pêşengîya gelek cûreyêñ edebî di warê Kurdî de kiriye. Ji van cureyan yek jî wergernasî ye, ku bûye mijara vê xebatê.

Taybetmendîya destnivîsa Kurd 43'yê ya herî berbiçav, wekî metneke edebî, pirzimanîbûna wê ye. Metnêñ Farsî, Kurmancî û Fransî ligel hev hatine dayin û ji bilî vana tîpguhêzîya metnê Kurmancî jî bi Latînî hatîye nivîsandin. Em vê taybetî yan rîbazê, di warê destnivîskarîyê de gelekî nabînin.

Wergera ku Bazîdî wekî wergérekî, di navbera Farsî û Kurmancî de ceribandîye, gelo çiqasî serkeftî ye? Berî sed sal û nîvekî qabiliyet û bêjedanka zimanê Kurmancî çiqasî dikarîbû Farsî ifade bikira? Ev her du pirsîyar ji bo dîrokçe û geşedana zimanê Kurdî gelekî girîng e. Berî ewqas sal di zimanekî de heger çalakîyêñ wergerîyê dest pê kiribin, ew wekî nîşana pêşdeçûna wî zimanî dikare bê qebûlkirin. Lê belê mixabin wiha tê xuyanê ku îro di destê me de metnêñ wergerê yêñ bo Kurmancî ne zêde ne.

62 Yê ku digihêje dawîya tiştekî û wê xelas dike.

63 Sil bûn. Rexne kîrin. Azirandin.


64 Sohbet. Guftûgo.

65 Tûxla.


---

## ÇAVKANÎ


- AKTAŞ, Ş. (1998). *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*, Akçağ Yayınları, Ankara.
- AYAN, G. (1991). “Mesnevi ve Kısa Hikâyecilik.” *5. Millî Mevlâna Kongresi*, Konya, Selçuk Üniversitesi.
- KAVRUK, H. (1998). *Eski Türk Edebiyatında Mensur Hikâyeler*, MEB, İstanbul.
- KAVRUK, H. (2000). Mensur Hikâyeler, *Türk Edebiyatı Tarihi 1*, TC Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara.
- PERTEV, R. (2014). “Tesîra Modernîzmê Li Ser Xebatê Pêşî Yê Folklorâ Kurdî-Tirkî”, *Journal of University of Zakho*, Hj. 4, r. 12-24.
- TANPINAR, A. H. (2000). “Roman ve Romanciya Dair Notlar”, *Edebiyat Üzerine Makaleler*, Dergâh Yayınları, İstanbul.
- TOSUN, N. (2017). *Doğu'nun Hikâye Kuramı*, Büyüyen Ay, İstanbul.
- TÖKEL, D. A. (2000). “Zihniyet ve Kaynakları Açısından Hikâyemize Bakmak” *Hece*, S. 46-47, s. 42-52.
- ÖZTÜRK, M. (2017). Koleksiyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsêñ Kurdi, Weşanêñ Lîs, Diyarbekir.
- YAZICI, H. (1998). “Hikâye”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, C. 17, İstanbul.
- Çavkanîyêñ Destnivîsi:
- BAZİDÎ, M.M. (Bêdîrok). *Koleksiyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsêñ Kurdi*, No: Kurd 42, St. Petersburg.
- BAZİDÎ, M.M. (1868). *Koleksiyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsêñ Kurdi*, No: Kurd 43, St. Petersburg.

**PÊVEK:**

**Pêvek 1:** Zerfa ku destnîvisa Kurd 43 ji aliye A. Jaba vê tê de hatîye parastin.



**Pêvek 2:** Di pêşîya destnivîsê de têbinîyên ku A. Jaba derbarê berhemê de nivîsîne.



**Pêvek 3:** Wereqa destnivîsê ya bi hejmara 1b'yê. Wekî tê dîtin, li hêlekê bi destxeta Bazîdî wergera çîrokên Farsî bo Kurmancî herfên Erebî heye û li hôala dinê jî típguhêzîya A. Jaba bi Fransî-Latînî heye.

I. (ou l'<sup>e</sup> Conte)  
Histoire 1<sup>re</sup> I<sup>er</sup> Conte.

مکاپ اول

دو زن ور طفهی مازعت بیکر دند و کواده  
 داشتند هر دو پیش قضی رقتند و اضافات  
 اس سujet d'un enfant, sans  
 avoir des preuves, toutes

دو زن ور طفهی مازعت بیکر دند و کواده  
 داشتند هر دو پیش قضی طبیعی و فرموده  
 این طفهی دو پاره کن و بجز دو زن  
 به زن پدرین این سخت شنید خاموش

لے پاری demanda pour justice.  
 Le Pardi fit venir un bœuf et  
 dit: coupe cet enfant en deux  
 parties et partage les entre  
 ces deux femmes.

ماهنه دو زن دیکر شور و قرباد اعاز کرد  
 برای خدا طفهی مازعت دو نیم ملت اکر پین  
 در انتظار دستور اخراج از پاره  
 تستا میکت، ل'autre com  
 mença à pleurer et à crier:  
 au nom de Dieu, dit-elle, nomme  
 point mon enfant en deux parties,  
 si telle est la justice, je ne veux  
 point cet enfant. Le Pardi n'eut  
 le courage que cette qui était  
 la mère de l'enfant, il la fit sortir

مکاپ دوم  
 زره راند

شخنه پیش بار شاهن رفت و عرض کرد  
 l'autre femme après avoir punie fouettée  
 Histoire 2<sup>ème</sup> II.  
 Une personne se présente devant  
 le Roi en exposant que lui exposez ceci:

**Pêvek 4:** Ev jî wereqeya 2a ye. Bazîdî di wereqên b'yê de jî bi destxeta xwe orijînalala metne, ku bi zimanê Farsî ne, istînsex kirîye û dû re jî Jaba ew wergerandine Fransî.



# ŞEHRIYAR'IN ŞİİRİNDE GELENEKÇİLİK VE NOSTALJİYE BAKIŞI

## Traditionalism and Nostalgia Perspective in Shahriar's Poetry

Ahmed FERŞBAFIYAN<sup>1</sup>

---

### Özet

Şehriyar mahlasını kullanan Seyyid Muhammed Hüseyin Behcet Tebrizî, İran'ın en ünlü çağdaş şairlerinden biri sayılır. Şehriyar'ın şiirlerinin en seçkin ve parlak içeriği, onun çocukluk döneminden köyde olan anılarının özlemi ve o günlerin nostaljisi oluşturmaktadır. Bu hususlar dikkate alınmadan onun şiirlerinin kritiğini yapmak mümkün değildir. Bu yazının amacı Şehriyar'ın şiirlerini bu açıdan araştırıp incelemektir. Bu incelemede takip edilen yöntem, köyde yaşadığı dönemde çocukluk hatırlarının ve deneyimlerinin, yanı sıra onun hayat tarzının, fikir ve hayal gücünün gelişmesinde ve bu olayların şiirinin içeriğine ve dış görünümüne olan etkisi temelinde şekillenmektedir.

Dogal bir ortam olan köyden göçmenin ve modern şehirlere yerleşmenin onda yarattığı acılar, çocukluk arkadaşlarından ve akrabalarından ayrılmmanın istirabı ve şehirde geçirdiği öksüz ve şaşkın hayat tarzi, aşina olduğu gelenekten uzak düşmesi ve hiç alışmadığı yeni geleneklerle karşılaşması, eski masum samimiyetin yok olması, modern yaşamın soğukluğu, sevgiliinden uzak düşmesi, yaşılığın zorlukları, yakınlarının ölümü ve bu gibi olayların yoğun bir halde onun şiirlerine yansıması, bu araştırmada elde edilen sonuçlardır.

Şehriyar egzistansiyalistler gibi, hayat çerçevesinden şire ve şiir ile duyguların hayatına bakmaktadır. Onun çevresi ve içinde olan nostaljik hisler onun şiirinin ve sanatının ilham kaynağı sayılmaktadır. Onun kişiliğinde şiir, duyguların hayatın birleştiği dönüm noktasıdır.

---

1 Assoc. Prof. Dr. Tebriz Üniversitesi/Iran: farshbafian@tabrizu.ac.ir

Not: Bu makale Yakın Doğu Üniversitesi'nde 11-14 Nisan 2017'de düzenlenen 1. Uluslararası M. H. Şehriyar Anısına Edebi Kongre'sinde tebliğ olarak sunulmuş ve tekrar gözden geçirilerek tashih edilmek suretiyle makaleye dönüştürülmüştür. A. Ferşbafiyân.

**Anahtar kelimeler:** Şehriyar, nostalji, gelenek, İran edebiyatı

### Abstract

Seyyed Mohammad Hossein Behjat Tabrizi, known by his pen name as Shahriar, is one of the greatest contemporary poets of Iran. The regretful recalling of the memories and experiences of childhood, especially the period of living in the village, the so-called nostalgia of those times, is one of the most prominent and striking themes of his poetry, which is so tightly intermingled with his emotions and art that, disregarding it, one cannot criticize his poetry. The purpose of this article is to study Shahriar's poetry from this perspective. The method of this study is to simultaneously analyze the effect of his memories and experiences of childhood and life in the paternal ancestry and living in the village on the poet's life, thought, imagination, and affection and the effect of those elements on creating the meaning and form of his poem. The result of this study shows that themes such as the bitterness of migration from a simple and intimate village to a mechanized city, the bitter and awesome separation from childhood friends and paternal and maternal relatives, and being mixed up in an unscrupulous city, the loss of traditional values that are inherent in the poet, and the emergence of new values to which the poet can never be accustomed, the bitter effect of the lost intimacies and facing indifferences rooted in mechanization, the sorrow of separation from the beloved, the agony of aging, the death of loved ones and the like have been specifically spotlighted in his poetry. Like existentialists, Shahriar sees poetry from the perspective of life and sees life from the perspective of poetry and affection. The environment and inherent nostalgic issues are the base and source of his poetry and art, and poetry, affection and life are united in his being.

**Keywords:** Shahriar, nostalgia, tradition, Iran's literature

### 1.Nostaljinin Tanımı

Nostalji iki kelimededen oluşan Fransızca bir bileşik sözcüktür. Bu sözcük ilk defa 1688'de "nostos" *eve dönüş* ve "algıya" *dert* ve *sıkıntı* anlamlı İsviçreli Yuhans Hofer adlı bir öğrencinin doktora mezuniyet tezinde ifade edilmiştir ki bir insanın mahzun ve depresyonlu bir halde anayurduna ve eve dönüşünü ifade eder. Nostalji, psikolojile ilgili konulardan sayılır ve bu alandan edebiyata dâhil edilmiştir. Geçmiş ve geçmişte oluşan geleneği ve şimdi var olmayan bir nesneyi hasret, burukluk ve sıkıntılı duygularla anılan ve dile getirilen konudur (Teqizâde, 1380 hş., 202).

İnsanî bilimler sözlüğünde bu sözcüğün anlamı şöyle yer almıştır: Gurbet üzüntüsü, geçmişi hasret ve sıkıntıyla anmak, geçmişle dönmeye arzulu ve is-

tekli olmak; vatan, aile ve çocukluk dönemi ve geçmişte olan siyasal, dini ve ekonomik durumları özleme his etmek ve anmak. (Âşûrî, 1381 hş., 246)

### **1.1.Nostaljinin Doğuşunun Temelleri**

Nostaljinin var oluşunun önemli dayanakları şöyle sıralanabilir: Yabancılık (göç hayatı), vatanından ve doğum yerinden uzaklık kalmak; çocukluk ve gençlik hatırlarını anımsama ve özlem duyma; takdir edilmiş dinî ve ulusal ünlü kişileri hatırlamak; hayatı veda eden dost ve yakın akrabaları anmak; yitirilen meslek, sosyal statü ve aşina yerleri düşünme; mitoloji, arkaizm, hatırlaların dillendirilmesi; arzuların karşısında başarısızlık; soyutlanmak ve bir köşeye sıkışmak (çık-maza girmek); zihinsel ve manevi yönleri bulunan sanatlarla uğraşmak...

### **1.2.İran Edebiyatında Nostaljinin İzleri**

Nostalji ilk önce psikolojik bir deyim olarak bir gurbet üzüntüsü ve depresyon manasında tanımlanıyordu. Ama sonraları başka bilimlerin, örneğin tarih, sinema, sanat, sosyoloji ve edebiyat alanlarına da girdi.

Gurbet üzüntüsü ve hasrete yönelik duygular Fars edebiyatında geçmişten bugüne ister manevi ve irfani, ister somut yerlere ve şeylere özlem olarak geniş ve farklı biçimlerde görülmektedir. Nostaljinin temellerinden faktörlerinden olan vatan ve doğum yerinden uzaklaşma hasreti İran'ın büyük şairlerinin çoğunda görülmektedir. Mevlâna şöyle der:

از جداییها شکایت می کند از نفیرم مرد و زن نالیده‌اند... بازجوید روزگار وصل خویش	بشنو از نی چون حکایت می کند کز نیستان تامرا ببریده اند هرکسی کو دور ماند از اصل خو
---	--

*Dinle bak! Ney nasıl da anlatıyor; ayrılklardan şikayet ediyor*

*Zira beni kamuşlıktan kestiklerinden beri; kadın erkek herkes benim feryadımdan dolayı huzursuz olup şikayet ediyor...*

*Kendi aslından (özünden) uzak kalan kimse; tekrar aslına dönme zamanının arayıp durur. (Mevlâna, 1371 hş., I/1)*

Hâfız da bu anlamda şöyle der:

خوشادمی که از آن چهره پرده بر فکنم روم به گلشن رضوان که مرغ آن چمن	حباب چهره جان می شود غبار تنم چنین نفس نه سزا چو من خوش الحانیست
---	---

*Bedenimin tozu (et kemik) ruhumun cehresinin örtüsüdür; o örtüyü can cehresinden kaldıracağım an, ne mutlu bir andır!*

*Bu beden kafesi, sesi güzel ben bülbüle reva değildir; ben iyisi cennet gülüşenine gitmeliyim, zira ben o çimenin kuşuyum. (Hâfız, 1383 hş., 247)*

Sadî'nin şiirlerinde de nostaljik hisleri görmek mümkündür:

مانده آسوده بخسبد چو به منزل برسد مگر کسی که به زندان عشق دربند است	قیمت وصل نداند مگر آزرده هجر شب فراق که داند که تا سحر چند است
--	---

*Ayrılık acısını çeken ancak vuslatın kıymetini bilir; yolcu evine varınca ancak rahat uyur.*

*Aşk zindanının tutsağı hariç, kim hicran gecesinin uzunluğunu kim bileyebilir?* (Sadî, 1381 hş., 454)

هه‌لېزاردن یه‌کیکه له و بنه‌ما سه‌رهکییانه‌ی که رولیکی گرنگی هه‌یه له به‌ره‌مهینانی شیوازدا. به جو‌ریک ده‌توانین بلىین شیواز هه‌لېزاردن، چونکه هه‌لېزاردنی نیشانه و که‌ره‌سته زمانیه‌کانی دیاریکراوه بق ده‌بربرینی هه‌لویستیکی دیاریکراو. ئه‌م هه‌لېزاردن له نیوان ئه‌و که‌ره‌سته و نیشانانه‌دا ده‌بیت که جیگیر و ئه‌لت‌رناتیقی یه‌کترن. واتا دوو و شه له زمانیکدا که هاواوتان و یه‌ک و اتایان هه‌یه، به‌لام له بنیاد و پیکه‌اته‌دا جیاوازن، جیاوازی شیوازیان هه‌یه و ده‌بنه هق‌ی دروستبوونی شیوازی جیاواز. بهم پیتیش بیت توانا و که‌ره‌سته‌کانی زمان له به‌ر ده‌ستی هه‌موو که‌سیکه و هه‌موو که‌سیک ده‌توانیت به‌پیتی پیویستی ده‌بربرینی خوی سوود له و که‌ره‌ستانه وه‌برگریت و هه‌لیان بژیریت. ئه‌م هه‌لېزاردن‌ش ده‌بیتته هق‌ی جیاوازی شیواز.<sup>۳</sup>

### ۳. لادان له باو

به‌شیوه‌یه‌کی گشتی زمانی ئه‌ده‌بیات و شیعیر زمانیکی خوازه‌یی و دووره له زمانی ئاسایی و باو، زمانیکه که یاساکانی زمان تیکده‌شکتینی تو له چوارچیوه ئاساییه‌که‌ی زمان ده‌ردەچیت بق‌ئه‌وه‌ی به‌هایه‌کی ئیستاتیکی و زمانه‌وانی به به‌ره‌مه‌که بیه‌خشیت. له ئه‌نجامیشدا شیوازی تاییه‌ت بق‌به‌ره‌هم و ده‌ق‌که فه‌راهه‌م بکات. بهم پیتیش شیواز ده‌ئه‌نجامی لادان و ده‌رچوونه له یاسا و ریسا ئاساییه‌کانی زمان.

### جو‌رەکانی شیواز

<sup>۳</sup> کلیات سبک شناسی، سیروس شیسیا، چاپ ۴، انتشارات فردوس، تهران، ۱۳۷۵، ص ۱۸ - ۲۹.

هه رچه‌نده ناتوانریت پیناسه‌یه کی گشتگیر و چه‌سپاو بۆ شیواز بکریت، به‌لام لەکەل ئەوهشدا دەتوانریت له روانگە و بوجوونی جیاوازه‌وه بە پیی چه‌ند پیوه‌ریکی جیاواز چه‌ند جوره دابه‌شکردن و پولینکردنیک بۆ شیواز ئەنجام‌دریت، کە له خواره‌وه دا ئاماژه بە هەندیک له و دابه‌شکردنانه دەکەین؟

- بە پیی ناوی ئە و کەسانه‌ی کە شیوازیکی تایبەتیان هەبوو. رەوتیکی نوییان له بواری ئەدەبیاتدا هیناوهتە کایه‌وه و بوبونه‌ته ریچکە و ئاراسته‌یه کە نووسه‌رانی دواي ئەوانیش په‌پرەوی شیوازی ئەویانکردووه له نووسینی بەرهه‌مه کانیان. ئەم جوره شیوازه شیوازی تاکەکەسی پی دەگوتریت.

- بە پیی تىگەیشتنی باهت. بى گومان هەموو بەرهه‌میکی ئەدەبی لەرپووی تىگەیشتن و وەرگرتنه‌وه له لای وەرگر لەیەك ئاستدا نین و له ئاستی جیاوازدان. بە پیی ئەم پیوه‌رە دەتوانریت دوو جوره شیواز دەستتیشان بکرین. شیوازی ئالۇز و داخراو، شیوازی ئاسان و رەوان.

- بە پیی جورى زمان. بە پیی ئە و پیوه‌رە چه‌ند جوره شیوازیک دەستتیشان‌کراون. بۆ نمۇونە شیوازی شاعیرانە، شیوازی زانستى، شیوازی پۇرۇنامە‌وانى.

- بە پیی باهت ياخود ناوه‌رۆکەوه. بەرهه‌می ئەدەبی ناوه‌رۆکی جوراوجور و جیاواز لەخۆ دەگریت، کە دەتوانریت بکریتە پیوه‌ریک بۆ دابه‌شکردن و پولینکردنی شیواز. دەتوانین بە پیی ئەم پیوه‌رە چەندىن جوره شیواز دەستتیشان بکەین. بۆ نمۇونە: شیوازی ئايىنى، شیوازی سیاسى، شیوازی سۆفیيانە... هتد.

بەلام له هەموو ئە و دابه‌شکردن و پولین کردنانه گرنگتر و باوتر دابه‌شکردن و پولینکردنی شیوازه بەپیی پیوه‌ری (تاکەکەس و سەردەم)، واتا شیوازی تاکەکەسی و شیوازی سەردەم (قۇناغ).

مەبەست له شیوازی تاکەکەس خویندنه‌وهی شیوازی ئە و شاعیر و نووسه‌رانیه، کە له سەردەم دیارىکراوه‌کاندا خاوهنى زمان و ئەدەبی تایبەت به خۆيانن ((له میانه‌ی توپىزىنەوه له بەرهه‌مه کانى هەر قۇناغىكىدا توشى شاعير يان نووسه‌ریک دەبىن کە بەرهه‌مه کانى بە بەراورد لەگەل بەرهه‌می هاوسه‌رەدەمە کانى خۆى جیاوازى تىادا بەدى دەکریت. لەم جوره بەرهه‌مانه‌دا و يېرىد دىاردە و تایبەتمەندىيە گشتىيەکانى ھاوبەشى هزرى و زمانى و ئەدەبی قۇناغ، هەندى تایبەتمەندى دىكە بەرچاۋ دەكەون، کە تایبەتن بە شاعير يان ننۇوسه‌ریکى تایبەت، بۆيە دەوتىریت ئەم شاعیرانە شیوازیکى تاکەکەسیان هەيە)): ئەم قۇناغە له زانستى شیوازانسىدا

٤ سباق شناسى شىعر، سپرس شميسا، چاپ ٩، انتشارات فردوس، تهران، ١٣٨٢، ص ١٢ - ١٣.

٥ شیوازی شیعرى جزیرى، شعبان چالى، ل ٢٩.

قوناغیکی ئالقز و زەحمىتە، ئەو شىوازناسانە لەو قۇناغەدا سەركەوتىن بەدەست دەھىن زۆر كەمن، بەلام ھەرچى شىوازى سەردەمە خويىندەوهى شىواز بە پىيى سەردەم و قوناغىكى ديارىكراوى ئەدەبى، چونكە بەرھەمى ھەر سەردەمەكى ديارىكراو بەھۆى كومەلېك ھۆكارەوە لە پۇرى خاسىيەت و تايىەتمەندىيەكانەوە بە شىوهەيەكى گشتى جىاوازە لە بەرھەمى سەردەمەكانى پىش خۆى و پاش خۆى. ھەربۇيە كاتىك لە بەرھەمى ماوهەيەكى مىژۇوېي ديارىكراو لە مىژۇوى ئەدەبىياتى نەتەوهەيەكى ديارىكرادا وردىيەنەوە، دەبىنن لە پۇرى ناوهەرقەك و بوخسار و گشت پىكھاتەكانىيەوە ھەست بە ھەبۇونى لايەنى ھاوبەش لە نىوان بەرھەمەكاندا دەكىرىت. ئەم لايەنە ھاوبەشانە ھەمان ديازىدە و خاسىيەتى تايىەتى ئەو قۇناغانەن، كە نىشاندەرى شىوازى قۇناغەكەن. كاتىك ئەم خاسىيەت و تايىەتمەندىييانە دەگۈرىن و تايىەتمەندى و خاسىيەتى تر جىڭەيان دەگۈرىتەوە. قوناغىكى نۇى سەرھەلەددەت.<sup>۱</sup> ھەر لەو بوانگەيەوەيە لە پۇرى شىواز لە يەكتەر جىاواز دەبن. ئەم جۆرە خويىندەوهە و پۇلىتكەرنى شىواز زىاتر لە سەر بىنەماي زانىارىي مىژۇوى ئەدەب و تا رادەيەك زمانەوانى ئەنجامدەدرىت.

### بەشى يەكەم: شىوازى تاھيربەگى جاف<sup>\*</sup> لە ئاستى زماندا

تايىەتمەندىيەكانى شىواز لە ئاستى زماندا لە سى تەوهەرى سەرەكى پىكىدىت، كە بىرىتىن لە (ئاستى دەنگ، ئاستى وشە، ئاستى پىستە). ئەم سى ئاستە بە شىوهەيەكى گشتى لە دەقى شىعريدا مۇسىقىاي شىعري پىكىدەھىن. لە شىعره كانى شاعيرىدا تىشك دەخەينە سەر تايىەتمەندىيەكانى مۇسىقىاي شىعري شاعير، بۇ دەرخىستن و دەستىشانكەرنى ئەو تايىەتمەندىيە شىوازىييانە يكە لە ئاستىزمان لە شىعره كانىدا بەدى دەكىرىن. مۇسىقىاي شىعري دابەشى سەر ھەردو جۆرە مۇسىقىاي (دەرەوە و ناوهەوە) دەبىت.

- تايىەتمەندىيەكانى شىواز لە ئاستى مۇسىقىاي دەرەوەدا

- كىش و سەروا

- تايىەتمەندىيەكانى كىشى شىعري تاھير بەگى جاف

شاعير لە ھۆنинەوهى شىعره كانىدا ھەردو كىشى خۆمالى و عەرروزى بەكارهەتىناوە، بەلام بە شىوهەيەكى گشتى پىزەى بەكارهەتىنانى كىشى عەرروزى زىاترە لە پىزەى كىشى خۆمالى، بە جۆرىك كە لە كۆى (۳۱) شىعريدا (۲۷) شىعري لە سەر كىشى عەرروزى و (۵) شىعري لە سەر كىشى خۆمالى داناوە. لەو (۲۶) شىعرهى كە لە سەر كىشى عەرروزى دانراون، تەنبا سى بەحرى (ھەزەج و

<sup>۶</sup>. كلىيات سېك شناسى، سېروس شميسا، ص ۷۰.

رەمەل و موزاریع)ی بەکارھیناوه. لە چوارچیوھی ئەو سى کیشەدا (ھەزەج) بە پلەی يەکەم هاتووه، كە ژمارەی ئەو شیعرانە بەو كیشە ھۆنراونەتەوە (١٧) شیعرن، ھەروەها كیشى (رەمەل) بە پلەی دووەم دىت، كە (٨) شیعر لە سەر ئەم كیشەن، كیشى (موزاریع) بە پلەی سیيەم دىت كە تەنیا (١) شیعر لە خۆ دەگریت.

بە پلەی يەکەم هاتنى كیشى ھەزەج لەلای شاعير جگە لە گونجانەكەی لەگەل تايىبەتمەندىيە دەنگىيەكەنی زمانى كوردى، بۇ ئەو دەگەریتەوە كە كیشىكى سووك و خىرايە لە كاتى خويىندنەوەدا پېرىان و وەستان كەمتر تىيدا بەدى دەكىريت. ئاواز و مۆسىقاي خۆش بە دەقەكان دەبەخشىت. نەك تەنانەت لەلای شاعير بەلكو لە ئەدەبیاتى كوردىدا لەلای زۆربەي شاعيران بە پلەی يەکەم بەكارھاتووه<sup>٧</sup>. بەمەش دەتوانىن بلىين بەكارھینانى كیشى ھەزەج بەو پلەيە لەلای شاعiranى كورد دىياردەيەكى شیوازىيە. بەكارھینانى كیشى رەمەل بە پلەي دووەم تايىبەتمەندىيەكى ترى شیوازى كیشە لای شاعير و مۆسىقايەكى زۆر جوانى بە دەقە شیعرىيەكان بەخشىوھ. تا پادەيەك كە ھەندىك لەو شیعرانە كراون بە گورانى، چونكە يەكى لە خۆشتىرين ئاوازى كیشەكانى عەرۇز كیشى رەمەل. بە شیوه يەكى گشتى پىزەھى بەكارھینانى كیش لای تاهيربەگى جاف لەم خشته يەھى خوارەوەدا دەردەكەۋىت.<sup>٨</sup>

رېزەھى سەدى	ژمارە	قىلابكىش	كىش	رەزەج
٦٥,٣٨٤%	١٧			ھەزەج
٤١,١٧٦%	٧	ھەزەجى ھەشتىي تەواو	أ	
٣٥,٢٩٤%	٦	ھەزەجى ھەشتىي ئەخربى مەكفووفى مەحزۇوف	ب	

٧ تاهير بەگى جاف كورى وەسمان پاشاي كورى موجەمەدە پاشاي كورى كەيخوسرهو بەگى كورى سليمان بەگى كورى قادربەگى كورى زاھيربەگى يار ئەممەد بەگى جافە كە لە عەشيرەتى جافن، لە سالى ١٨٧٥ ئى زايىنى لە شارى ھەلەبجى شەھيد لە دايىك بۇوه، لە سالى ١٩١٧ ئى زايىنى بە ھۆى نەخوشىيەوە كۆچى دايى كردووه.

شیوازى شیعرى جزىرى، شعبان چالى، ل. ٩٣.

٨ راپەرى كیشى شیعرى كلاسيكى كوردى، عەزىز گەردى، چاپ / يەكەم، چاپخانەي / دىكەن، سليمانى، ٢٠٠٨، ل. ١٧٥.

۱۷,۶۴۷%	۳	هزه‌جی شهشی مهقسوور	ج		
۵,۸۸۲%	۱	هزه‌جی هشتنی موسسه‌به‌غ	د		
۳۰,۷۶۹%	۸			رهمه‌ل	۲
۸۷,۵%	۷	رهمه‌لی هشتنی مه‌حزووف	أ		
۱۲,۵%	۱	رهمه‌لی هشتنی مهقسوور	ب		
۳,۸۴۶%	۱			موزاریع	۳
۱۰۰%	۱	موزاریعی هشتنی ئەخرب	-		
	۲۶		٧		

### -. تاییه‌تمهندی سه‌روای شیعری تاھیربەگی جاف

مامه‌ل کردنی شاعیر لەگەل سه‌روای شیعره‌کان مامه‌لیه‌کی تاییه‌تە، چونکە له (۳۱) شیعردا تەنها سى شیعرى بە مەسنه‌وى ھۆنیوھتەوە، ئەگەرنا لە سه‌رجەم شیعره‌کانى ترى پەيرھوی يەكىتىي سه‌روای كردووھ، كە قالبە سه‌لیقە کى باۋى شیعرى كۆنە و سەرتاپاى شیعره‌كە بە يەكەوە دەبەستىتەوە مۆسىقاىيە کى جوانى پى دەبەخشىت. ئەمەش دەگەریتەوە بۇ توانا و دەسەلات و سه‌لیقە شاعیر. دەكىرىت ئەم رېزە بەكارھىتىنەي يەكىتىي سه‌روالا له لايەن شاعیرەوە بە دىاردەيەکى شىتوانى تاییه‌ت بە شاعیر لە قەلەم بىدەين. نموونە شیعرى ھەردوو جۇرە سه‌روایەکە:

أىيەكىتىي سه‌رووا، قالبەكەي (AA,BA,CA,DA,EA,FA,...)

قوربانى پۇخت بىم كەشكىستى بە قەمەردا  
ھەيرانى لەبت بىم كە پەواجى بەشەكەردا  
ھەر لەحزە ئەدەي وەعدەيى وەسلىٰ ونىيە ئەسلىٰ  
كارت وەكى دۇنيا يەھەر ئەمرۆيە بە فەردا  
مەقسۇودى لە سەر كوشتنى عوششاقى زەعىفە  
وەختى كە دەكا خەنچەرى تىئىزى بە كەمەردا (ديوانى شاعير: ل ۳۴)  
ب - مەسنه‌وى، قالبەكەي (AA, BB, CC, DD,...)

شەھەنشاشى مەئوای پوح و دىيدە و ھۆش

حۆكم دارولمولک دللهی پر نه جوش

دەلیلە يرھ مەی ئاهو و رەفتاران

سەر دەستەی گرۇی نازک نازداران

گولبۇی گولبۇخسارگول بەرگ ئەندامە

گول خونچە لەبان گولین ژىر جامە (دیوانی شاعیر: ل ٤٥)

- رەدیف لە شیعری شاعیردا

پاش سەروا (رەدیف) رۆلیکی گرنگی لە بونیاتنانی مۆسیقای دەرەوەی شیعردا  
ھەیە و يارمەتیدەری سەرواپا، مەبەست لىي ((ئەو وشە يان دەستەوازە يان  
رېستەیە، كە لە دواى وشەی سەروا لە كۆتايى لەت يان دىرە شیعر بە ھەمان  
مانا دووبارە دەبىتەوە)) . ئەم دووبارە بۇونەھە مەبەستدارە. ھەرچەندە پىزەھى  
بەكارھەتىنەنی رەدیف لای شاعیر زور كەمە، لە چوارچىۋە (٣١) شیعردا ئەم  
دىاردەيە تەنبا لە (٧) شیعريدا بەدى دەكىرىت، بەلام لەگەل ئەوھىدا شاعير  
لە كۆى ئەو (٧) شیعرە وشەی (وھە) ئى كردۇتە پاش سەروا بۇ (٣) لە  
شیعرە کانى، ئەم دىرە شیعرانە خوارەوە نمۇونە ئەو دووبارە بۇونە وەن:

دل نەخۇشى دەردى ھىجرەجانى جانانم وھرە

لەت لەتە جەرگ و ھەناوم ماهى تابانم وھرە

عىلەتى دەرد و شەفا كەم وا بە ليى شەككەرت

مايىي ژىن و حەياتم دەرد و دەرمانم وھرە (دیوانی شاعیر: ل ٦٤)

دل لە ھىجرت وا لە خەمدا ماهى كەنغانم وھرە

زەخەمە جەرگم بۇ فىراقت زووبە لوقمانم وھرە

سەد تەبىب هات و عەلاجى ئەم بىرینانە نەكىد

تۈعەلاجى زەخەمە كەم كە سا بە ئامانم وھرە (دیوانی شاعیر: ل ٦٦)

مەمکۇژە جانا بە ھىجران ئەی جەفاكارم وھرە

تابوتاقەت چوو بە جارى يارى خەمخوارم وھرە

بۇچ ئەوەندە ئارەزۇوت بۇ قەتلى ئەم بىچارەزار

كوشتنى ئاشق درىغ مەفەرمۇ سەردارم وھرە (دیوانی شاعیر: ل ٧٠)

٩ . سەروا، عەزىز گەردى، ل ٢٧٤

### - تاییبه‌تمه‌ندییه‌کانی شیواز له ئاستی موسیقای ناووه‌ووهدا

ههرييکه له شاعيران به هۆى كۆمه‌لېك هونه‌ری شيعرييە‌ووه موسیقاي ناووه‌ووه شيعر بونيات دهنن. ليرهدا ئاماژه به و هونه‌رە شيعرييانه دهکه‌ين، كه شاعير له بونياتنانى موسیقاي ناووه‌ووه له شيعره‌کانيدا سوودى لى وهرگرتۇوه.

### - دووباره‌كىرىنە‌ووه

زوربەي ئەو بنه‌مايانى بەشدارى له دروستيۇنى موسیقاي ناووه‌ووه شيعردا دهکەن، به شىوه‌يە‌كى گشتى پشت به بنه‌ماى دووباره كىرىنە‌ووه دەبەستن. دووباره‌كىرىنە‌ووه له بچووكترىن كەرسىتە كە (دهنگ) د دەست پىدەكتات بۆ گەورەترين كەرسىتە كە (رسە) يە. ليرهدا ئاماژه به تايیبه‌تمه‌ندىي ئەو دووباره‌بۇونەوانه دهکەين له شيعره‌کانى شاعيردا. شاعير ئەو دياردەيە‌لە خزمەتى لايەنی موسىقى شيعره‌کانيدا زۆر بەكار هىتاواه، به جۆرىك كە دەتوانىن به ئاسانى له شيعره‌کانيدا هەستى پىتكەين.

دووباره‌بۇونە‌ووه دەنگ كە هەردوو جۆرە دووباره‌بۇونە‌ووه هاونه‌بزوينى و هاوبىزويىنى لەخۆ دەگرىت، به شىوه‌يە‌كى بەرچاوا له شيعره‌کانى شاعيردا رەنگىدواته‌ووه و رۆلى گرنگيان له بونياتنانى موسىقاي دەقه شيعرييە‌کاندا بىنيو، بەلام به شىوه‌يە‌كى گشتى رېزە‌دەنگى دووباره‌بۇونە‌ووه دەنگى بزوين زياتره له رېزە‌دەنگى نەبزوين. ئەمەش دەگەرەيتە‌ووه بۆ شىوازى شاعير له بەكارهەتىنى كىشى شيعرى، چونكە بەشىكى زۆرى شيعره‌کانى له سەر كىشى هەزەجە، دواى ئەويش رەمەل به پلەي دووھم دىت. ((ئەم دوو كىشى بە هۆى لە باربۇونيان بۆ بەكارهەتىنى بەرده‌وامى بزوينى درېش، لەسەر خۆترن لە كىشى رەجهز و سەریع)) . لە چوارچىۋە‌دەنگى بزوينە دووباره بۇوه‌کانىشدا رېزە‌دەنگى دووباره‌بۇونە‌ووه دەنگى بزوينى (٥) لە هەموويان زياتره. وەك لەم نموونانە‌خواره‌ووهدا كە رېزە‌دەنگى دووباره‌بۇونە‌ووهيان (٢٠) جارە:

دلبەرەي قەد عەر عەرە‌بى رەحىمە‌كەي بەدبەختە‌كەم

دلىفىنە‌شۇخە‌كەي بى عەهد و پەيمانم وەرە  
(ديوانى شاعير: ل ٦٤)

لەو سوورەتە مەھ پەيکەرە لەو سەرۇوھ رەوانە

لەو زولفە سىيا مارە كە ئەو گەنجە دەكا پاس  
(ديوانى شاعير: ل ٤٣)

١٠. شىوازى شيعرى جزىرى، شعبان چالى، ل ١١٣.

له کاتی خویندنه وهی شیعره کاندا دووباره بیونه وهی بزوینی دریز ریگه له خیرایی خویندنه وه دهگریت. ئەم نموونه شیعرییانه خواره وه نموونه ئە و جۆره خویندنه وانه:

جاری ناپرسی له حالی من مەگەر نازانی تو

زار و بیزار و نەزارەم کاری من هەرزاريه (دیوانی شاعیر: ل ٧٢)

لەم دیرەدا (١٠) جار دووباره بیونه دهنگی بزوینی دریزی (ا) بیونه ته بهربەستیک له بهردەم خیرایی ریتمی شیعره کە. هەروهە نموونه يەکیتر بۆ ئەم دیاردەدیه دیرە شیعره کە خواره وهی، کە (١٤) دهنگی (ى) ای تیدایه، بزوین پدریزی (ى) (١٠) جار و نەبزوینی (ى) (٤) جار. هەروهە بزوینی کورتی (٥) (١٢) جار دووباره بیونه ته وه:

بە خەمزەی چاوی مەخمورى سیاهى مەستى مەی کردىن

بە ماچى لیوی موستەغنى له ئەنواعى مەزەی کردىن (دیوانی شاعیر: ل ٥٨)

لەلای شاعیر هەندیکچار دهنگی بزوینی کورت بە شیوه يەکی سەرەنجر اکیش لەگەل دهنگە نەبزوینە کان کۆ دەبىتە وه و پىکەوە رۆل له پىکەیانى ریتمی مۆسیقاي شیعردا دەبىن. هەروهک لەم نموونه يەدا بەدەردەکە ویت:

گەنجۇر و نگەھبانى دەھان و دەھمی تەنگە

تابۇورى موژانت لەگەل ئەگرچە بەرابەر (دیوانی شاعیر: ل ٧٧)

(١٢) جار دووباره بیونه وهی بزوینی کورتی (٥) لەگەل (٦) جار دووباره بیونه وهی دهنگی نەبزوینی (ن) و (٥) جار دهنگی نەبزوینی (گ) و (٥) جار دهنگی نەبزوینی (ر) دا ریتمی ئەم دیرە شیعرییه يان پىکەیناوه.

- دیاردەی قرتاندنی دەنگ -

ەل رۆز ىلا رعىش بە تەبیات ىزاویش كە يامىس كەنەد ىندناترقە. يەشۇ كىيىنەھى كىيىنەد دنە چەن ايد كىيىنەد ىندناترقە. تىرکەد وەرىيەپ نارىعاش كە، ادگەندەي تىمائە لەگە بېرىھاتى ىزاویشى ناكە يىتەبیات دەرايد ەلەرتى كىكەيد مەئ كە يەنۇمىز دنە چە بە ھېمامە ادھەريلە. تىيوھە كەد واقچە بى ناوارف بە ادىنا كەرعىش ەل نىيەكەد

نه مدیت	←	نه مدی
کات	←	کا
حیگئی	←	جیئی
گهلهک	←	گهلهکی
دهست	←	دهس
بستراؤ	←	بستراؤ
دنت	←	دئ
بکه	←	که
یهکیک	←	یهکیکی

### - رهگه زدؤزی لای شاعیر

رهگه زدؤزی و جوړه کانی یهکیکن له و هونه ره شیعرييانه، که رهگه زدؤزی کرنګ و به رچاو له پیکهاتهی پیتمی موسیقای ناوهوهی شیعردا ده بینن. ئه مه هونه ره شیعريي به هه موو جوړه کانیي وله لای شاعير جیگهی سه رهنج و باي خ پیدانه، به شیوه یهکی به رچاو له شیعره کانیدا به دی ده کرین. به گشتی له کوی (۳۱) پارچه شیعريدا (۷۸) دياردهی رهگه زدؤزی به کارهيناوه. زوربهی رهگه زدؤزی کان له جوړی رهگه زدؤزی ناته واون، له چوار چیوهی جوړه کانی رهگه زدؤزی ناته واو، رهگه زدؤزی جوړی جودا به پلهی یهکم و داتاشراو به پلهی دووهم و زیاد به پلهی سییه م دین. که لیردهدا چهند نموونه یهک له و رهگه زدؤزیانه دخهینه پوو:

- رهگه زدؤزی ته واو

به موئمين چيسه قهه دوزه خ جهه ننه م

مه قامي رووسیان و پرووسیانه (دیوانی شاعیر: ل ۸۴)

له هیجراني خه زان تاكهی به ئومیدی گولان تاكهی

له نه غمهی بولبولان تاكهی خوا فه سلی گولان بابی (دیوانی شاعیر: ل ۸۶)

- رهگه زدؤزی ناته واو

أ. جوړی جودا

یاران فهرهاد مهربووه ناکامهوه

په رئ ئاخو داخ من هه رمامهوه (دیوانی شاعیر، ۴۸)

بهدس بادی سه با چونکه په شیوه نه زمی زولفهینت

منی چاره سیا بؤیه هه موونه زمم په ریشانه (دیوانی شاعیر: ل ۷۶)

ب. جۆری داتاشراو

دلدار دلبهه ستەمكار نەدىت

ئاھووی خوتەنی وەش رەفتار نەدىت (دیوانی شاعیر: ل ۰۴)

عىللەتى دەرد و شەفاكەم وا بە لیوی شەككەرت

مايەيی ژین وحەياتم دەرد و دەرمانم وەرە (دیوانی شاعیر: ل ۶۴)

ج. جۆری زياد

بە خەمزەی چاوی مەخمووری سیاھی مەستى مەی كردىن

بە ماچى لیوی موستەغنى لە ئەنواعى مەزەی كردىن (دیوانی شاعیر: ل ۵۸)

جارى ناپرسى لە حالى من مەگەر نازانى تو

زار و بىزار و نەزارم كارى من هەزارىه (دیوانی شاعیر: ل ۷۲)

دووباره بۇونەوهى وشە ئەو دياردەيەيە كە وشەيەك بە هەمان ماناي خۆى دوو جار يان زياتر دووباره بېتىه وە، چەندىن جۆرى جياوازى هەيە!“ ئەم دووباره كردنەوهى لە شىعەرەكان يشاعيردا لە هەردۇو ئاستى ستۇونى و ئاسوئى دا خراونەتپۇو. كە مۆسىقايەكى خۆشتىر بە دىرە شىعەرەكان دەبەخشىت، نموونەيەكى بەرچاوی ئەم دووباره كردنەوه مۆسىقىيە ئەم پارچە شىعەرە خوارەوهى:

گولبۆی گولپەخسار گولبەرگ ئەندامە

گولخونچە لەبان گوللىن ژىر جامە

سەر پەنجە گوللىن وەھوون ئەو دل

وەھار ئاماوه پەيدا بى نەو گول (دیوانی شاعیر: ل ۴۵)

۱۱. موسىقى شىعەری، د. محمد رضا شفیعی کەنکنی، چاپ ۶، انتشارات اگاه، تهران، ۱۳۷۷، ص ۳۰۵.

لهم جوره دووباره کردن‌وهیدا ریزه‌ی دووباره کردن‌وهکان له ئاستى ئاسقىي دا زياتره، خۆى له هەردۇو جوره دووباره بۇونه‌وهى (بەدوايىھەك و بلاوو دوور لەيەك) دا دەبىنیتەوه. له چوارچىۋە ئەم دوو جۆرەشدا دووباره بۇونه‌وهى بلاو و دوور له يەك زياتره. ئەم جوره بەكارهیتانه له لای شاعير بۇونتە هوئى دلگىرتر بۇونى مۆسیقاي شىعرەكە و هەر بۇ ئەم مەبەستەش بەكارهاتووه.<sup>۱۲</sup>.

#### - ئاستى وشه

شىوارى شاعير لهم ئاستەدا زۆر سەرەنجراكىشە و فەرەنگى وشهى فراوانە، هەر سى فەرەنگى وشهى كوردى و عەربى و فارسى له خۇ دەگرىت. بە شىوەيەكى گشتى فەرەنگى وشهى فارسيي شاعير فراوانترە له فەرەنگى وشهى عەربى، چەندىن شىعىرى بە زمانى فارسى ھەيە و زياتر بە ئەدەبى فارسى كارىگەرە.

#### - وشه كلىيىھەكان له شىوارى شىعىرى تاهير بەگدا

وشه كلىيىھەكان له شىوارازدا ئەو وشانەن كە چەندىن جار له لايەن شاعير له شىعرەكانىدا دووباره دەكىرىنەوه و جەختى له سەر دەكىرىتەوه. ھەموو ئەو دووباره بۇونه‌وهيدەش مەبەستى خۆى له پىشته و رەنگانەوه و ھەلگرى هزر و بىرى نۇوسەرن. زۆر جار ئەو وشه كلىيىانە دەبنە تايىەتمەندىي شىعىرى شاعير كە بە هويانەوه دەناسرىتەوه. دەتوانىن له چوارچىۋە شىعرەكانى شاعيردا ئەم وشه كلىيىانە خوارەوه بخەينەروو:

وشه كلىيىھەكان	دووباره بۇونه‌وهيدە	وشهى كلىيىھەكان	دووباره بۇونه‌وهى	وشهى كلىيىھەكان
دل	۳۴ جار	ئەبرۇ	۱۰ جار	جار
گۆل	۲۵ جار	دۇورى	۹ جار	جار
درد	۲۵ جار	فېراق	۹ جار	جار
لىيۇ	۱۸ جار	قوربان	۸ جار	جار
زولف	۱۵ جار	لوقى	۶ جار	جار
دېدە	۱۴ جار	عىلاج	۶ جار	جار
چاو	۱۲ جار	شەكىر	۶ جار	جار

دووباره بۇونه‌وهى ئەم وشانە بەو رېزه‌يە له لای شاعير ئەوه دەردەخات، كە شاعير خاوهنى عەشقىكى مەجازى بۇوه و عاشقى رەگەزى بەرامبەر (كچ) بۇوه،

۱۲ . سەروا، عەزىزگەردى، دەزگاي ئاراس، چاپى يەكمەم، ھولىنر، ۱۹۹۹، ۱۶۷، ل.

وهسفي جوانى و سەرنجراکىشى ئۇو كچە دەكەت، لە دوورى ئۇو هەميشە دل برىيندار و سەرگەردان بۇوه. هەروهك لە دیوانەكەشیدا ئاماڭەدى پى كراوه كە عاشقى كچىكى جولەكە بۇوه بە ناوى (شیوه) كە لە هەلەبجە ژیاون. تەنانەت شیعرى ((بەغەمزمەھى چاوى مەخموورى ...)) اى بۆئەوداناوه.

### - بەكارھەيتانى راناو لەلای شاعير

بەكارھەيتانى راناوى (من و تو) لە شیعرەكانى شاعيردا دووبارەبۇونەوە زۇرى ھەيە بە جۆريک كە راناوى (من) (٥١) جارو (تو) (٤٢) جار بەكارھاتووه، واتا راناوى كەسى يەكەمى تاك زیاتر بەكارھاتووه لە راناوى كەسى دووهمى تاك. ئەمەشيان تايىەتمەندىيەكى شیوازى شىعريي شاعيرە كە شیعرەكانى كىتراھە وە بارى دەرۈونى خۆيەتى و بۇ ئەم مەبەستەش ناچارە كە راناوى كەسى يەكەمى تاك بەكار بەھىتىت، چونكە لە كاتى كىتراھە وە بارى دەرۈونى خۆى رېكەيتى نىيە. بەم شیوهەش شاعير زیاتر سەرەنچى لە سەر خۆيەتى و تەنانەت زۇر جار خۆى دەدوینىت و راناوى كەسى دووهمى تاك بۇ ئەم دوواندنه بە كار دىنيت.<sup>۱۳</sup>

### شیعرەكانى تاهیربەگ بە پیوانەي ھاوكىشەي بۆزیمان

ھاوكىشەي بۆزیمان يەكىكە لە ھاوكىشەكانى شیوازاناسىي ئامارى ((بەپىي ئەم ھاوكىشەيە رېزەي ژمارەي (كار) بەرامبەر ژمارەي (ئاوهەلناو)، لە شیعر و ئەدەبدا زیاترە لە بوارى زانستى و ئاخاوتى ئاسايى، ھەروھا ئەم رېزەيە بە پىي رەگەز و بارى ھەست و سۆزى شاعير دەگۈرى، واتە چەند ھەست و سۆز ئاۋىتەي شیعرەكە بىت، ئەم رېزەيە دەچىتە سەرىي)).<sup>۱۴</sup> بە پىي ئەم ھاوكىشەيە رېزەيەست و سۆز لە شیعرەكانى شاعيردا كەمە، چونكە رېزەي ئەم ھاوكىشەيە لە شیعرەكانى شاعيردا (٢٩٤,١) يە. بەم شیوهەيە خوارەوه:

#### Number of Verbs

ژمارەي كار

$$\frac{\text{ژمارەي كار}}{\text{ژمارەي ئاوهەلناو}} = \text{VAR (Verb - Adjective Ratio)}$$

#### Number of Adjectives

$$\frac{348}{269} = 1,294$$

13. شیوازى شیعرى جزىرى، شعبان چالى، ل ١١٧.  
14. ھمان سەرچاوه، ل ١٥٠.

بهشی دووهم - شیوازی تاهیر بهگی جاف له ئاستی ئەدەب و هزردا

لەم باسەدا تىشك دەخەينه سەر تاييەتمەندىيە بەرجەستەكانى ئەدەبى  
و هزرى لاي شاعير و دەرخستنى كاريگەربۇونى شاعير بە شیوازى چەند  
قۇناغىكى شىعرى فارسى.

باسى يەكم: له ئاستى ئەدەبدا:

چەند تاييەتمەندىيەكى بەرچاوى ئەدەبى له شىعرى شاعيردا

لە ئاستى ئەدەبىشدا بە هەمان شیوهى ئاستى زمان ھەندىك نىشانەى  
شیوازى بەرجەستە هەن، كە بە ئاسانى لە شىعرەكانى شاعيردا بەرچاۋ دەكەون  
و ھۆكارى كاريگەرن بۆ ناسىنەوهى شىعرى تاهير بەگ. گرنگىرىن ئەم نىشانە  
بەرىتىن له مانەى خوارەوه:

۱. گرنگىدانى شاعير بە ھەردوو ئاستى ئاسۇيى و ستوونى زمان له شىعردا  
بە ھۆى زۆرى بەكارھىنانى (لىكچواندن و خواستن).

۲. ئاوىتەكردىنى ھەستەكان لاي شاعير

۳. پەچاۋ كردىنى ھاوتا - مراعات النظير

- ئاستى ئاسۇيى و ئاستى ستوونى له شىعرى تاهير بەگدا

ئەم دوو ئاستە له شىعردا يەكىكىن له و بابەنانەى كە بە تەواوى جىڭەى خۆيان  
لە لىكۈلینەوه شیوازانناسىيەكاندا كردىتەوه. لە لاي شاعيران (رېزەرى گرنگى دان  
بە دوو ئاستە جياوازە و ئەم جياوازىيەش جياوازى شیوازى لىكەوتۇوهتەوه.  
جياوازى دوو ئاستەكە زىاتر خۆى لە بەكارھىنانى خواستن (استعارە - Metaphor)  
و لىكچواندن (تشىپە - Simile. (دەنۋىتىت))<sup>۱۰</sup>. پەيوەندىيەكى دوو لايەنە له نىوان ئەم  
دوو ئاستەدا ھەيە بە جۆريک كە گرنگىدان بە ھەر كاميان لە بەكارھىنانى  
ئەوي تر كەم دەكتەوه و رېزەرى بەكارھىنانەكە بە پېوەريکى سەرهەكى بۆ  
بەدەستىشانكىرىنى شیوازدادەنرىت. لە بەكارھىنانى ئەو دوو ئاستە له لاي  
شاعير ھاوسەنگىيەك دەبىرىت، بەلام بە شىوهەيەكى گشتى رادەى بەكارھىنانى  
لىكچواندن زىاترە له (خواستن) كە دەكتە (۸۷) لىكچواندن و (۷۰) خواستن. كە  
لىرەدا چەند نموونەيەك دەخەينەپۇو:

۱۵ . كلييات سبک شناسى، دكتور سيرروس شميسا، ص ۲۸۵

### - نموونه‌ی لیکچواندن -

خالی حبهشی قرچه دهخاته دلی ئاشق

شمშیری بروی سینه دهکا شەق وەکو ئەلماس (دیوانی شاعیر: ل ۴۳)

لەم دىرە شیعرەدا دوو وینەی لیکچواندن ھەن: يەکەمیان / (شمშیری برو) لىرەدا شمشیر (لەوچووه)، برو (لېچووه)، بە شمشیر چویندرابە. دوومیان / سینه (لېچووه) بە (ئەلماس) چویندرابە، كە دەبىتە (لەوچووه).

### - نموونه‌ی خواستن -

پۆزى تەرەب و فەسلی گول و وەختى بەهارە

ياران گولەكەم كوا كە دەمى بۆس و كەنارە (دیوانی شاعیر: ل ۶۲)

لەم دىرەدا خواستنى ئاشكرا ھەيە، كە وشەی (گولەكەم)، شاعیر لە جياتى ناوى يارەكەی بەكارى هيئاواه.

دەلیي تۇراوە قىبلەي ئاشقانت

كە ئەمرۆ كەچ بۇوە مىحرابى ئەبرۇوت (دیوانی شاعیر: ل ۳۸)

لەم دىرەدا (مىحرابى ئەبرۇ) خواستنى درکاوه، چونكە (ئەبرۇ) مىحرابى نىيە، بەلام شاعیر لە رىيگەي ھونەرى لادان كە لادانى بەتەنكىرىنى پى دەگۆتۈرت (مىحراب) ئى داوهتە پاڭ (ئەبرۇ).

ناھق نىيە ناوهستى ئەگەر پىرى تەحەممۇل

سېروانى سريشكم كە ئەكا هاژە لە سەردا (دیوانی شاعیر: ل ۳۴)

لىرەدا شاعیر لە رىيگەي دىاردەي لادانى (بەتەنكىرىنى) وشەی (پىرى)، كە بابەتىكى بەرجەستەيە و قەبارەي ھەيە و تەنە، داۋىيەتە پاڭ وشەي (تەحەممۇل) كە شتىكى مەعنەویيە و بەرجەستە نىيە. بە ھۆى ئەم دانەپالە (تەحەممۇل) ئى كردىتە تەن كە پىرى ھەيە، وينەيەكى خواستنى درکاوى بەرھەم هيئاواه.

### - ئاویتەكرىنى ھەستەكان -

مەبەست لىي ئاویتە كردى دوو ھەست يان زىاتە لە كاتى دەربىرىندا. ئەم جۆرە دەربىرىنە لە قىسىم ئاسايى خەلکىشدا بەرچاۋ دەكەۋىت، بەلام زىاتە لە ئەدەبدە پەسەندىتە، چونكە ئەدەب خۆى جۆرە لادانىكە لە فۆرمى ئاسايى زمان.

له زمانی ئاساییدا هەستەکان زیاتر بە جیا دەردەکەون نەک ئاویتە<sup>۱۶</sup>. ئەم تایبەتمەندىيەی ئەدەب بە جۆريک لە شىعرەكانى شاعيردا رەنگى داوهتەوە، كە دەكىرىت بە نىشانەيەكى شىوزاي شاعير لە قەلەم بدهىن. بە گشتى ئەم ئاویتە كرانە لە لاي شاعير زیاتر خۆى لە ئاویتەبۇونى هەستى چەشتىن لەگەل هەستەكانى تردا دەبىنتەوە. بە جۆريک كە (چەشتى شىرىينى) لەگەل هەموو هەست و باپەتىكدا ئاویتە دەبىت. وەك لەم نموونانەي خوارەودا:

۱. هەستى چەشتى شىرىينى لەگەل هەستى بىنин و ديمەنەكان:

(لىوى شەكەرت، نەخلى لىتۇي، شەھدى لىوت، شىرىين ئەرمەن، ...).

۲. هەستى چەشتى شىرىينى لەگەل هەستى بىستان و دەنگ:

(شەكەر بارى لىوت، نەزمەكەي پر شەكەرەت، شىرىين گوفtar، لىوى شەكەربارى، ...).

۳. هەستى چەشتى شىرىينى لەگەل باپەتى زەينى و مەعنەوى دا:

(شىرىين پەفتار، پۇحى شىرىينم، شىرىينە وەسلى ياران، ...).

- رەچاو كردنى ھاوتا (مراعات النظير)

ئەم دياردەيە بە واتاي ئەو دىت كە لە شىعردا وشەى وا پىكەوە بگۈنچىزىن، كە پەيوەندىيان بە يەكتەرەوە هەبىت و دەكىرى ئەم پەيوەندىيە لە رەنگەز و پىكەتە و لىكچۇون و ھاوارىيى و ھاوبابەتى بىت<sup>۱۷</sup>. ئەم جۆرە دياردەيە بە فراوانى لە شىعرەكانى شاعيردا دەبىنرىت، كە دەكىرىت بە دياردەيەكى شىۋازى شىعىرى شاعير دابنرىت. ھەندىك نموونەي ئەم دياردەيە لاي شاعير دەخەينەپۇو:

دەرد و ئەلەميش گشتى بەوە لىم بۇوە دوژمن

بۇ چاك و شەفاكىرىنى ئەم دەردە دەواچن (ديوانى شاعير: ل ۳۵)

لەم دىرەدا (دەرد، ئەلەم، چاك، شەفاكىرىن) پەيوەندىيەكى باپەتىيان ھەيە، كە باپەتەكەش نەخۇشىيە.

سەد تەبىب هات و عەلاجى ئەم بىرینانەي نەكىد

تو عەلاجى زەخەمەكەم كە سا بە ئامانم وەرە (ديوانى شاعير: ل ۶۶)

۱۶. شىۋازى شىعىرى جزىرى، شعبان چالى، ل ۱۶۵.

۱۷. فەرنەنگ اصطلاحات ادبى - سىما داد، انتشارات مرواريد، چاپى ۳، تهران، ۱۳۷۸، ص ۲۶۸.

لەم دىرە شیعرەدا پەیوهندىيە ھاوارىيى لە نىوان و شەکانى (تەبىب، عەلاج، برىن، زەخ) دا بەدى دەكىت.

دەبى کاول بى مولكى دل بە تاراجى سوپاھى خە

هەتا شاھەنشەھى ئىشقەت لەۋىدا مىسىلى سولتانە (ديوانى شاعير: ل ٧٦)

لەم دىرە شیعرەدا و شەکانى (مولك، تاراجى سوپاھ، شاھەنشەھ، سولتان) دا پەیوهندىييان بەيەكەوه ھەيە.

گۈلزارى ئىرەم سوورەتى زىبای قەدى تۆيە

گوشە چەمەن و پۇويى گۈل و پايى چنارە (ديوانى شاعير: ل ٦٢)

لەم دىرەدا پەیوهندىيە ھاوارىيى لە نىوان و شەکانى (گۈلزار، قەد، چەمەن، گۈل، چنار) دا ھەيە، كە پەیوهندىيەكەشيان لە پۇوى پۇوهك بۇونىيانە، دەكىت بلېين پەیوهندىيەكى ھاوارەكەزىشە.

برق و پوخسار و زولف و ليۇى ئالىت

شەو و پۇڭچىق و هىلال و عىقد و مەرجان (ديوانى شاعير: ل ٥٥)

لەم دىرەدا پەیوهندىيە بەش بە گشت لە نىوان و شەکانى (برق، ليۇو، پوخسار) دا ھەيە، چونكە ھەرييەكە لە (برق و ليۇو) بەشىكەن لە پوخسار، ھەر رۇھە پەیوهندىيلىكچۈن لە نىوان و شەکانى (برق و هىلال) و (پوخسار و پۇڭچىق) و (ليۇو و مەرجان) دا ھەيە.

بەزم و تەرەب ئامادەيە ساقى مەيى فەرمۇو

دەنگى دەف و ئالەي نەي و ئاوازەيى چەنگە (ديوانى شاعير: ل ٧٧)

لەم دىرەدا و شەکانى (دەف، نەي، چەنگ) بەشىكەن لە بابەتى گشتىي مۆسىقا.

حاجى وەرە ئەم قاپىيە گەر تالىبى دىنى

سەد حەجج و دوسرە عومرە تەوافيكى مەزارى (ديوانى شاعير: ل ٩٢)

لەم دىرەدا و شەکانى (حاجى، تالىبى دىن، حەجج، عومرە، تەواف) پەیوهندىي باپەتىيان ھەيە لە چوارچىوهى ئەركى ئايىنى دا.

## باسی دوووه: له ئاستی هزردا

له پووی ئاستی هزرییه و شیعره کانی تاهیر بەگ تاپاده کی زور هەمان شیوازی شیعری کلاسیکی کوردییه و پەپرەوی له شیوازه کرد ووه، که له و سەردەمەدا باوبووه، بەلام بە داهینان و رەسەنایەتی خۆیه و، له پووی ئاستی هزرییه و شیعره کانی شاعیر چەند ناوەرۆکیکی کەمی له خۆگرتووه و بە دەوری چەند مەبەستیکی دیاریکراودا دەخولینەوە، وەکو زۆربەی شاعیره کلاسیکه کانی تر له زۆربەی ناوەرۆکه شیعرییه کان شیعری نەھۇنیوەتەوە، لىرەدا هەولەدەن ئەو مەبەستانەی شاعیر شیعری له پیناوانیاندا ھۆنیوەتەوە بخەین پوو و له ویوە بتوانین شیوازی شاعیر شیعری دەستنیشان بکەین.

### - دلداری

شیعره کانی تاهیر بەگی جاف زیاتر له دەوری بابەتی دلداریدا دەخولینەوە، چەند شیعرییکی کەمی نېبىت ئەوانیتەر ھەمووی ھەلگری ناوەرۆکیکی عاشقانەن و گوزارشت له ھەست و سۆز و دەرروونی شاعیر دەکەن، شیوازی تاهیر بەگی جاف له شیعره دلدارییه کانیدا بە گشتی ھەمان شیوازی شیعری کلاسیکی کوردییه و وەکو شاعیره کلاسیکە کان گوزارشتی له ھەست و سۆز و دەرروونی خۆی بەرامبەر بە یارەکەیکردووه، بەلام بە تایبەتمەندی و داهینانی خۆیه و.

تاهیر بەگ له شیعره دلدارییه کانیدا بە شیوازیکی ھونەری بەرز گوزارشتی له ھەست و سۆزی خۆی کرد و شیعره کانی پېن له وینەی ھونەری بەرز و بەکارهەتانیکی چر و پىرى ھونەرە کانی پەوابنیزى، بە گشتی شیعره کانی شاعیر غەم بالى بە سەردا کیشاوه و گوزارشت له غەم و ئازارە کانی شاعیر دەکەن:

ھەرچەندە دەمیکە له خەما غەرقەیی خوونم

ھەر لەحزە له دەس جەورى فەلەک مات و زەبۈونم

بەسراوه بە زەنجىرى ئەلەم گەردەنی شەوقم

مەشھورە لەناو ئەھلى جىهانشۇرى جنۇونم

ئەلەفى قەدەكەم راست وەکوو تىرى خەدەنگ بۇو

وا خەم بۇوه ئىستاكە ئەلېيھەلقةيى نۇونم (دیوانى شاعیر: ل ۵۰)

ئەم غەمباري و حەزىنېيە لەم شیعرەدا ھەستى پىتەکریت له زۆربەی شیعره کانی شاعیردا ھەستى پىتەکریت و لاى شاعیر بۇوه بە دیارىدە، ئەم غەم و حەسرەتەی شاعیر زیاتر بە ھۆکارى دوورى و جوودايىتى له مەعشووقە کەم

و شیعره کانی زیاتر گوزارشت له دهردی دووری و هیجرانی شاعیر دهکن له  
مه عشووقه که‌ی:

هیجرانی گه‌لی موهلیکه بۆ به‌نده و هکوو سه‌م

هه‌م سینه‌یی سوزانه و هه‌م دیده‌یه پر نه‌م

زووخاو و خه‌می دوورییه خوراکمه هه‌ر ژه‌م

تاب و ته‌بی ئاته‌شکه‌دیی هیجری و هکوو شه‌م

نیزیکه منیش واریدی سه‌حرایی فهناکا (دیوانی شاعیر: ل ۳۶)

ئه‌م دهردی دوورییه مه‌عشوق غه‌میکی واى له دلی شاعیر دروست کرد ووه،  
که هه‌ر دههم ئاواته‌خوازی بینین و گه‌یشتنه‌ووهی به و هسلی مه‌عشوقه‌که‌ی و به  
هه‌ستیکی پارانه‌وه داوای گه‌رانه‌وه له مه‌عشوقه‌که‌ی دهکات بۆ ئه‌وهی تیماری  
دهردی دوورییه که‌ی بکات:

دل نه‌خوشی دهردی هیجره جانی جانام و هره

له‌ت له‌ت جه‌رگ و هه‌ناوم ماهی تابانم و هره

علله‌تی ده‌رد و شه‌فاکه‌م وا به لیوی شه‌ککه‌رت

مایه‌یی ژین و حه‌یات‌مده‌رد و ده‌رمانم و هره

سه‌د شوکر دووباره جه‌ژنه‌وه‌ختی عه‌یش و شادییه

بۆ به‌لاگه‌ردانی بالا تقوچی قوربانم و هره (دیوانی شاعیر: ل ۶۴)

شاعیر له چه‌ندین شیعردا داوای هاتنى یاره‌که‌ی دهکات و تا ئاستى پارانه‌وه  
و لیی پاراوه‌ته‌وه، که بگاته فریای و ئه‌وه دهردی هیجرانه‌ی بەکه‌س تیمار ناکریت  
بۆی تیمار بکات و ببیتە سارپیزی غه‌مه‌کانی:

دل له هیجرت واله خه‌مدا ماهی که‌نعمانم و هره

زه‌خمه جه‌رگم بۆ فیراقت زووبه لوقمانم و هره

سه‌د ته‌بیب هات و عه‌لاجی ئه‌م برينانه‌ی نه‌کرد

تو عه‌لاجی زه‌خمه‌که‌م که سا به ئامانم و هره

گه‌ر ده‌زانی چه‌ن په‌شیوه حاله‌که‌م بۆ دیده‌نت

سه‌د ئه‌وه‌ندەی زولفه‌کانت دل په‌ریشانم و هره (دیوانی شاعیر: ل ۶۶)

شاعیر له چهندین شیعردا وشهی (وهره)ی کردووه به پاش سهرووا بو شیعرهکانی و ئەم دیاردهیه له شیعره دلدارییهکانیدا بوروته بەشیک له شیوازهکەی.

له گوزارتشت کردن له هەست و سۆزى خۆى بەرامبەر بە مەعشتووقەکەی، شاعیر سوودى له بۇودا و كەسايەتى و سەرکرده و شوينە مىژۇوپىيەكەن و چىرۇكە عاشقانەکانى پېشىو وەك (شارى بابل، ئەسکەندر، شەرى ژاپۇن و فەرەنگ، يوسف، بابانەكان، لەيل و مەجنۇون، شىريين و فەرھاد ... هەت) وەرگرتتووه، لەم رېگەيەوه گوزارتى لە هەست و سۆزى خۆى بەرامبەر بە يارەکەی کردووه و چهندین وينەي جوانىشى ئافرالندۇوه:

تابورى موژانت له گەل ئەگرچە بەرابەر

وهستاوه ئەلىي لەشكىرى ژاپۇن و فەرەنگە (ديوانى شاعير: ل ٧٧)

يان دەلىت:

نه من ماچى لەبى توم بۇو بە قىسمەت

نه ئەسکەندر گەيشتە ئاوى حەيوان (ديوانى شاعير: ل ٥٦)

يان:

نهماوه شارى بابل چاھى هارووت

له كوى خويىندۇویه ئەفسۇون چاوى جادووت (ديوانى شاعير: ل ٣٨)

دياردهیهکى ترى شیوازى كە له شیعرهکانى شاعيردا هەستى پىددەكرىت وينە پىچەوانەكانە، له شیعرى كلاسيكى كوردىدا زياتر وا باوه كە شاعير بو دەرخستنى جوانى و ناسكى و وەسفى يارەکەي، دىت يارەکەي بە سروشت و شتە جوانەكانى ناو جىهانى سروشت دەچۈنۈت، ئەم دیاردهیه لاي تاهير بەگىش رەنگىداوەتەوە، بەلام له چەند شوينىكدا چەند وينەيەكى پىچەوانەكى كىشاوه و سروشتى بە جوانى يارەکەي چواندۇووه، ئەم دیاردهیه زياتر لاي مەولەوي هەستى پىددەكرىت و جگە لە مەولەوي (١٨٠٦-١٨٨٢) و تاهير بەگ ئەم دیاردهیه لاي كەم شاعيرى تر دەبىنرىت، تاهير بەگ لە رېگەيە ئەم وينە پىچەوانانەوە هەست و سۆزى خۆى بەرامبەر بە يارەکەي دەربىريوه:

نمۇونەي رووپىي تۆيە ماھى تابان

نەزىرى مۇوپىي تۆيە رەنگى قەتران (ديوانى شاعير: ل ٥٥)

يان دەلىت:

## گولزاری ئيرهم سووره‌تى زىيابى قەدى توپىه

گوشەی چەمن و رووپىي گول و پايى چناره (ديوانى شاعير: ل ٦٢)

- ئايىنى -

وەكى پېشتر خستمانەپۇ شىعرەکانى تاهير بهگى جاف زىاتر بە دەورى باپەتى دلدارىدا دەخولىتەوە و بەكەمى لای لە باپەتەكانى تر كەرىۋەتەوە. يەكىن ئەننىيە، شاعير بۇ ئەم مەبەستە سى شىعىرى ھۆنۈوهتەوە، تاهير بەگ لە شىعرە ئائىنىيەكەندا زىاتر بەلای (نەعت) دا رقىشتووە و تىيانىدا زۇرتىر وەسلى پېغەمبەر (د. خ) كەردووە و لىيى پاراۋەتەوە تاوهەكى لە دۇنيا شەفاعةتى بۇ بکات:

مەلجه ئۇ پىشت و پەناھى غەيرى لوتفى توپىيە

گەر ببەخشى وەر نەبەخشى جان نىسان و چاكەرم

تالىبى دىيابى شەفاعةت كەس نىيە وەك من بە جان

بۇ مەتاعى رەحىمەتى توپىمۇ من سەوداگەرم

نابى من تەنها لە لوتفت بى نەسىب و بەھەرم

چونكە فەرمۇوتە شەفيق و شەھسوارى مەحشەرم

نەعتى شاھى ئەنبىيا ((تاهير)) كە هاتە سەر زوبان

جىلوو بەخشى زەوقە ئىمپۇ نەزمەكەي پەشەكەرم (ديوانى شاعير: ل ٤٩)

بەھەمان شىپوھ لەم شىعرە خوارەوەشدا وەسلى پېغەمبەر (د. خ) دەكەت و داواى شەفاعةت و لىخۇشبوونى لىتەكەت و دەلىت:

مەتلەعى سوبى سەعادەت مەزەھەرى ((علم اليقين))

ئەي سېھسالارى فەوجى ئەنبىائۇلمۇرسەلين

بۇ نەوازش زاتى حەق ھەم حوجەت و ھەم دەنگى تو

شاھىدى تەعزىزمى تو بۇ ياوەرى رۆحولەمين (ديوانى شاعير: ل ٥٢)

شاعير لە شىعىيەكى تردا پۇ لە خانەقاى بىيارە دەكەت و پۆحى خۆى وابەستە بە بىيارە دادەنتىت، لەھەمان كاتدا يادى پېغەمبەر (د. خ) و يارانى و رابەر و شىخانى تەرىقەتى نەقشىبەندى و قادرى دەكتەتەوە و دەلىت:

مهربووته حهیاتم به بیاره و به دیاری  
 خۆزگەم به سهگی قاپیهکەی قوتبی مهداری  
 ئەم کاولە دونیایە له نە زیر و زەبەر بى  
 پاش ئەحمەدى موختار و ئەبووبەكر و سى يارى  
 فاروقى زەمان حەزرەتى نائىبى شىخ عوسمان  
 واسل بۇو به دەرگاھى كەرمەنەتى بارى (ديوانى شاعير: ل ٩١)  
 شاعير لەم شىعرەدا هەر لە چوارچىوھى باسى ئايىدا ماوەتەوە، بەلاى  
 عىرفان و تەسەوفدا نەرۋىشتۇوو و نە لەم شىعرە و نە لە هىيچ شىعرييکى تر  
 ھزرى عىرفانى و سۆفييگەرى لە شىعرەكانى رەنگى نەداوەتەوە.

#### - ھزرى فەلسەفى

تاھير بەگ لە شىعرەكانىدا زۆر كەم بەلاى ھزرى فەلسەفیدا چووه و ناوهەرۆكى  
 شىعرەكانى زىاتر دىلارين، بەلام لە شىعرييکىدا كە وەكو پرسىيار بۇ (نارى)اي  
 شاعيرى ناردۇوە، كۆمەلىك پرسىيارى فەلسەفىيى تىدايە، كە كۆمەلە پرسىارييکى  
 وجودىن و بەردەوام لای مرۆڤ جىڭاي پرسىيارو تىرامان بۇونە:

خودا عەدللى لە لای عارف عەيانە  
 بە حەققەت ئىمە گەللەين ئەو شوانە  
 لەبەرچى وا مەرى خۆى مەردى چۈپان  
 بە دەستى خۆى ئەخاتە بەر نىشانە (ديوانى شاعير: ل ٧٩)  
 يان دەلىت:

ئەگەر خەلقە لە بۆمان ئىختىيارى  
 لەبەرچى يەك بچووك و يەك كەلانە  
 يەكى بۇ پارە نانى جان فرۆشە  
 يەكى حەققى نىيە شاهى جىهانە (ديوانى شاعير: ل ٨٠)  
 ئەگەر سەيرى تەواوى شىعرەكە بکەين دەبىنин ھەمووی خىتنەرپووی ئەو  
 پرسىيارانەيە، كە لە لای تاھير بەگ دروست بۇون و لە ھەولى بەدەستخىتنى  
 وەلامەكانىيانە.

شاعیر لە شیعره کانیدا لە چەندین شویندا باسی دونیا دهکات و شیوازه کەی تاراده یەک لە شیوازی مەحوی دەچیت، کە پوانییکی پوچگە رایانەی بۆ دونیا ھەیە و بە پوچ سەیری دونیا دهکات، دونیا بە ئافرەتیکی لە شفروش و بە درەوشت دەچوینیت، کە ھەر شەھەی لە باوهشی کەسیکە، بۆیە داوا دهکات کە دلبهندی دونیا نەبین و نەکەوینە داوی دونیا:

دونیا کە ھەموو لە حزە بە مەعشۇوقى كەسیکە

بنوارە کە چەن قەحبە چ كۈنە تەرەسیکە

تىفكەرە وەکوو كەلبى نىھان گىرى زەمانە

ئەبنائى جىھان يەك بە يەكى سەگمەگەسیکە

عالەم ھەموو وەك تەيرە تەممە دانەئەمەل داو

سەپيادى ئەجەل ساھەتى دونیا قەفەسیکە (ديوانى شاعير: ل ٧٣)

بەم شیوه یە باس لە دونیا دهکات و بەم دېرە شیعره کوتايى بە شیعره کە دینیت:

((تاهير)) مەبە ئازورىدە زەمان عادەتى جەورە

دونیا کە ھەموو رۆزى ژنى بولھەوەسیکە (ديوانى شاعير: ل ٧٤)

يان لە شىعرييکى تردا دەلىت:

وەرە ((تاهير)) مەبەستە دل بە دونیا

بە زاهير جوان وباتىن پىر و فەرتۇوت (ديوانى شاعير: ل ٣٩)

ئەنجام

۱. تايىبەتمەندىيە کانى شیوازى شاعير لە ئاستى زماندا زىاتر لە ھەردۇو تەوەرى دەنگ و وشەدا بەرجەستە كراون.

ئاستى مۆسىقىي شاعير يەكىكە لە تايىبەتمەندىيە شیوازىيە کانى شاعير، تاهير بەگ شیعره کانى بە ھەردۇو كىشى خۆمالى و عەرۇوزى ھۆنيوەتەو، بەلام پىزەتى بەكارھىتىنى كىشى عەرۇوزى زىاترە، لە كىشە عەرۇوزىيە کانىشدا كىشى (ھەزەج) و رەمەل و موزاريي(ى) بەكارھىتىناوە، لە كىشە عەرۇوزىيە کانىشدا كىشى (ھەزەج) لەپلەتى يەكەم دىت. لە سەررواشدا ھەردۇو جۇرى (سەروايى) يەكگىرتۇو و مەسنهۋى(ى) بەكارھىتىناوە.

ههروهها چهندین دیاردهی تری و هک (رهدیف، هاویزونی، هاونهبزوینی، رهگهزدوزی) موسیقای شیعره‌کانی شاعیریان بهیز کردوه.

له ئاستی وشهدا هنهنیک دیاردهی شیوازی له شیعره‌کانیدا ده بینرین، فرهنه‌نگی وشه‌کانی زور فراوانه و فرهنه‌نگی وشهی هرسنی زمانی (کوردی و فارسی و عهربی) له خق دهگرت، بهلام فرهنه‌نگی کوردیه‌کهی به پله‌ی یه‌که‌م دیت و فارسی به پله‌ی دووهم و عهربی به پله‌ی سیئم. وشه کلیلیه‌کان له لای شاعیر ههمه‌رهنگ نین، بهلکو زیاتر له گروه‌پی (پروخسار و بهژن و بالای ئافرهت، خهم ودهردی دووری) دان.

به‌کارهیتاني راناو له لای شاعیر بووهته دیاردهیه‌کی شیوازی، که‌راناوی که‌سی (یه‌که‌م و دووهم) ای تاکی زور دووباره کردوه، بهلام راناوی (من) ای زیاتر به‌کارهیتاناوه. دیاردهیه‌کی تری ئاستی وشه لای شاعیر له هاوکیشیه بعوزیمان ده‌ردکه‌ویت، که تییدا ریزه‌ی (کار) زیاتره له‌ریزه‌ی (ئاوه‌لناو)، بهمه‌ش ریزه‌ی (VAR) نزم ده‌بیته‌وه بۆ (۱،۲۹۴)، بهمه‌ش ئاستی شیعریه‌تی به‌رهمه‌که نزمه.

۲. له ئاستی ئه‌ده‌بدا شاعیر زیاتر گرنگی به ئاستی ئاسویی زمانداوه، بهو پییه‌ی هونه‌ری لیکچواندنی به پله‌ی یه‌که‌م به‌کارهیتاناوه و خواستن به پله‌ی دووهم. ههروهها له لای شاعیر ئاویته‌کردنی ههسته‌کان تایبەتمه‌نديه‌کيتری شیوازی شاعیره، که تییدا ههمو شتیک و ههمو ههسته‌کان ئاویته‌ی ههستی چه‌شتن (شیرینی) ده‌کات، جگه له‌مه (رهچاوکردنی هاوتا) يه‌کيکيتره له دیارده شیوازیه‌کان لای شاعير.

۳. شیعره‌کانی تاهیر به‌گی جاف زیاتر به دهوری بابه‌تی دلداریدا ده‌خولینه‌وه و گوزارشت له غه‌م و حهسره‌تی شاعیر له دووري ياره‌که‌ی ده‌کهن، شاعير هه‌ردهم ئاواته‌خوازی بینين وگه‌يشتته‌وه‌هی به ودسلی مه‌عشوقه‌که‌ی، ئه‌مه‌ش بووهته شیوازی شاعیر له شیعره دلداریه‌کانیدا. جگه له‌مه شاعير له شیعره دلداریه‌کانیدا بۆ گوزارشتکردن له ههست و سۆز و ده‌روونی خۆی سوودی له ره‌دواد و که‌سايه‌تی و سه‌ركده میژووییه‌کان و چيرۆکه دلداریه‌کانی پیشيو و هرگرتووه، له‌م ریگه‌یه‌وه گوزارشی له ههست و سۆزی خۆی به‌رامبهر به ياره‌که‌ی کردوه. ئافراندنی وينه‌ی يېچه‌وانه‌ش له شیعره دلداریه‌کاندا به‌شىكه له شیوازی شاعير.

شیعری ئاینیش يه‌کيکه له و بابه‌تانه‌ی که شاعير شیعری له پیتناویدا هونیوه‌تەوه، شیعره ئاینیه‌کانی تاهیربەگ زیاتر به‌لای نه‌عت و يادکردن‌وه‌ی پیغه‌مبه‌ر (د. خ) و يارانی وشیخانی ته‌ريقه‌تی نه‌قشبەندی و قادری ده‌چن.

هزری فەلسەفیش بەشیکە له بابەتەکانی شیعرەکانی شاعیر و کۆمەلیک پرسیاری فەلسەفی له شیعرەکانیدا خستوتەرروو، کە ئەم پرسیارانە کۆمەلیک پرسیاری وجودین و بەردەوام لای مرۆڤ چىگاپی پرسیار و تىرپامان بۇونە.

### سەرچاوهکان

#### - بە زمانی کوردى

- دیوانى تاهیر بەگی جاف، کۆکردنەوە و ساغ کردنەوەی (حەسەن گوران)، چاپى يەكەم، دەزگاپی رۆشنبىرى گوران، سنندج، ۲۷۱۱ کوردى.
- رابەری کىشى شیعرى کلاسیکى کوردى، عەزىز گەردى، چاپى يەكەم، چاپخانەی دېکان، سليمانى، ۲۰۰۸.
- سەروا، عەزىز گەردى، دەزگاپی ئاراس، چاپى يەكەم، ھەولىر، ۱۹۹۹.
- شیوازی شیعرى جزىرى، شعبان چالى، چاپى يەكەم، چاپخانەی حاجى هاشم، ھەولىر، ۲۰۰۸.
- بە زمانی عەرەبى
- علم الاسلوب مبادئ و اجرا ئاته، د.صلاح فضل، ط / الاولى، دار الافق الجديد، بیروت، ۱۹۸۵.

#### - بە زمانی فارسى

- سبک شناسى شعر، سيروس شميسا، چاپ ۹، انتشارات فردوس، تهران، ۱۳۸۲.
- فرهنگ اصطلاحات ادبى - سيما داد، انتشارات مرواريد، چاپ ۳، تهران، ۱۳۷۸.
- كليات سبک شناسى، سيروس شميسا، چاپ ۴، انتشارات فردوس، تهران، ۱۳۷۵.
- موسيقى شيعرى، د. محمد رضا شفيقى كدكنى، چاپ ۶، انتشارات اگاه، تهران، ۱۳۷۷.

### الملخص

الاسلوب في الاشعار الكردية لطاهر بك الجاف

هذه الدراسة محاولة لتحديد و بيان الخصائص الأسلوبية التي تميز اشعار طاهر بك الجاف عن اشعار الشعراء الآخرين.

يتكون هذه الدراسة من تمهيد و قسمين، تناول التمهيد مصطلح و مفهوم الأسلوب و انواعه. اما القسم الاول فدرس خصائص الأسلوب على المستوى اللغوي. في حين اختص القسم الثاني بخصائص الأسلوب على المستوى الأدبي و الفكري

وقد تم بيان اهم النتائج في نهاية الدراسة.

### Kurdish Poetry styles of Tahir Bagi Jaff

#### Abstract

This research is about “Kurdish Poetry styles of Tahir Bagi Jaff” which is in essence an attempt to analyse stylistic approaches of Tahir Bagi Jaff’s poetry, for which he can easily be distinguished amongst other poets. This research contains a preface and two parts: In preface section, the researcher attempts to shed light on concepts, phrase and poetic styles. In first part, the unique poetic approaches of the poet have been analysed, especially in terms of language. In second section, however, the special approaches by the poet in terms of literature and innovative thinking has been studied. Thus, in the end section, the conclusion of the research is given.



# BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

**ORTAK ATASÖZLERİNİN HİKÂYELERİ:**

**FARSÎ-KURMÂNCÎ-ZAZAKÎ -6-**

Hasan ÇİFTÇİ

**ÇİROKÊN WERGER ÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ (1797-1870)**

Mustafa ÖZTÜRK

**ŞEHİRİYAR'IN ŞİİRİNDE GELENEKÇİLİK VE NOSTALJİYE BAKIŞI**

Ahmed FERŞBAFIYAN

شیوازی شیعره کوردییە کانی تاهیر بەگی جاف

یادگار رەسول / کوردستان عەبدولوھاب